Azadiya
# WELAT

Rojnameya Hefteyî

87

SAL: 2

27 Rezber - 2 Kewçêr (Ekim) 1997

BUHA (Fiat): 75.000 TL



# Rahêjin be[illegible]şan, dakevin ko[illegible]anan

Danerê vê çalakiyê Parêzer Engîn Cinmen jî çalakî wekî referandûmekê bi nav kir û got ku, ev çalakî ne girêdayî tu kom û rêxistinên siyasî ye. Cinmen li ser pirsa me ya wekî "Raya giştî ji axaftina li ser Susurlukê aciz nebûye" jî wiha got: "Na, tiştekî wisa nîn e. Ji ber ku ew ji dewleta huqûqî aciz bûnê. Ev jî dawiya her tiştî ye. Her wiha mafê kesî nîn e ku ji vê yekê aciz be." Li ser heman mijarê Sekreterê Giştî yê Partiya Aştî û Demokrasiyê (DBP) Fehim Demir jî da zanîn ku ewê piştgiriya vê çalakiyê bikin.

RÛPEL 3

**Helbestvan Seydayê Tîrêj:**

## Helbesta ku mirov nehejîne, ne helbest e

Rûpel 8-9

**Alaattin Aktaş:**

## Manewiyata gelekî, çeka herî bikêr e

Rûpel 4-5

**Zülküf Kışanak:**

## Şehîdê Dêrsimî embaz Müslüm Solgun

Rûpel 6

# NAVEROK




10

Ehmed Şerîfî: Ji bexçeyê helbestên soranî du gul



11

Azad Altun: Antonio Tabucchi li Tirkiyeyê bû



13

Samî Berbang: Berhemeke hêja ji bo azadiya Leyla Zana


## W — Zimanê Azadiya Welat

SAMÎ TAN

Vê hefteyê me divê ku em li ser rojnameyê hinek tiştan bibêjin. Her wekî bala we xwendevanên hêja jî dikişîne, piraniya nivîsên ku di vî quncikî de derdikevin, li ser rojeva siyasî ne. Heta ku ji me tê em dixwazin, rojeva hefteyekê li gorî zanîna xwe şîrove bikin. Em vê yekê pêwist dibînin, lewre nûçeyên ku di rojnameyê de derdikevin, pirî caran bersiva vê yekê nadin.

Sedema vê yekê jî diyar e, Azadiya Welat rojnameyeke hefteyî ye, rojev berî hefteyekê tê diyarkirin. Her çiqas hin caran, rojeva rûpelên nûçeyan li gorî rûdanên ne–asayî bê guhartin jî, ev tişt kêm caran pêk tê û pirî caran em li pey rojeva ku me berî hefteyekê diyar kiribû, diçin. Lewre jî ji bo me dibe hewcedariyek ku em vî quncikî bihêlin roja dawîn, ta ku em karibin rûdanên dawîn jî bigirin nava quncik. Lewre jî hin caran, nivîseke ne bi dilê me derdikeve holê û tê de hin tashîh jî cih digirin.

Divê bê gotin ku kêmasî ne tenê di nivîsa quncik de, di gelek nivîsênn din de jî balê dikişînin. Sedemên vê yekê jî, hene lê me dil nîn e ku em van sedeman ji kêmasiyên xwe re bikin hincet, ev kêmasiyên me ne û divê em rast bikin, riyeke din li ber me nîn e.

Lê, dîsa em dixwazin li ser arîşeyan, çend têbiniyan li vir binivîsîn. Da ku xwendevan rewşê baştir fêm bikin. Arîşe û problemên li ber zimanên me gelek in, mirovên me xwe bi xwe hînî xwendin û nivîsandinê bûne, lewre jî hinek nivîsên ku ji me re tên, gelek çewtiyên rastnivîsî û rêzimanî dihundirînin. Heta ji me tê em wan rast dikin, lê dîsa jî em nikarin nivîsan bi awayekî tekûz pêşkêşî we bikin; tê de hinek çewtî dimînin.

Hin caran guherînên ku em di nivîsan de çêdikin, ne bi dilê nivîskar in, hinek rexne jî ji ber vê yekê ji me re tên. Heta ji me tê em rexne û daxwazên wan jî li ber çavan digirin. Lê rastiyek heye, her weşan xwediyê hinek rêz û rêçikan e, di domana demê de digel qayîdeyên berê, hinek tiştên nû derxistine holê, belkî ew qayîde li gorî hinekên din çewt bin, lê heta baweriyeke giştî di vî warî de çênebe, ew sazî dê li ser gotina xwe bimîne.

Ev yek ji bo me jî wisa ye, dema mirov Welat, Welatê Me û Azadiya Welat gişkan bike yek, 5–6 sal in ku em di nav vî karî de ne, lewre jî hinek tecrûbe çêbûne, di vê domanê de dibe ku me gelek tişt çewt jî kiribin, lê bingehek hatiye afirandin. Lewre jî kesê ku ji vê rojnameyê re nivîsan dişîne, divê vê rastiyê li ber çavan bigire.

Her wiha divê xwendevan û nivîskarên me bizanin ku em di nava rojnameyê de piştevaniya tu devokan nakin. Her xebatkarekî rojnameyê ji herêmeke Kurdistanê ye; ji Elbistan û Semsûrê bigire heta Agiriyê, Mêrdîn, Bidlîs, Amed, Sêrt û Êlihê... her yek ji wan di bin bandora devoka xwe de ye, lê heta ji me tê em zimanekî hevgirtî bi kar tînin. Hemû qalib û şayesên zimên; ji çi herêmê dibin ew zane, malê me ne, piştî ku em bi rastbûna wan ewle dibin, em bi rihetî bikar tînin, lê dîsa jî em giraniyê didin, ên ku pirtir tên zanîn. Di neqandina peyvan de jî em li ser heman rêbazê dimeşin. Di nivîsên nivîskaran de jî ji bilî xeletiyên rêzimanî em destê xwe nadin zimanê wan.

Heta ji me tê em zimanê weşanên din ên kurdî li ber çavan digirin, lê em ji wan jî hêvî dikin ku di xeletiyan de serhişkiyan nekin, da ku em karibin zimanekî hevpar pêk bînin û karê xwendevanên zimanê kurdî hêsantir bikin.

## Ji Xwendevanan

***BERÎ** çend mehan min bi xêra hevaleke xwe rojnanmeya Azadiya Welat nas kir. Di demeke kurt de ez hînî zimanê kurdî bûm û ez tê gihîştim ku divê ziman, çand û hunera kurdî di demeke kurt de bi pêş bikeve.*

*Ji bo pêşketina ziman û çanda kurdî çiqas rewşenbîr berpirs bin, ewqasî xwendevan jî berpirs in. Li gorî min divê her xwendevan û her kesê ku rojnameya Azadiya Welat nas dike, rexneyên xwe yên der barê rojnameyê de binivîse û bi van rexneyan re jî ji bo pêşketina rojnameyê xebatê jî bike.*

*Rexneya min a yekemîn jî li nivîskarê quncikan ên Azadiya Welat e, hefteya borî min dît ku du quncikê rojnameyê vala ne, li gorî dîtina min ev yek nîşana sersariyê ye. Divê tiştê wisa nebin.*

KAWA AGIR / STENBOL

***MERHEBA** hevalno!*

*Hevalên ku em di dîlana têkoşînê ya ji bo guhartina sîstema peritî û kevneperest, bi pergaleke sosyalîst, azad, demokratîk û wekhev de mil bi mil in, ji we hemûyan re merheba!*

*Em di xebat û têkoşîna we de serfiraziyê dixwazin û em ji we re ji vir silav û hurmetên xwe dişînin.*

GIRTIYÊ TİKB'YÎ TUNCAY BAL / GIRTÎGEHA SARUHANLIYÊ – MANİSA

# Ziman xwe–îfadekirina rastiyê ye

GURGÎN TORÎ

**Zimanê hunerê ji bo gelê me nayê xebitandin. Gelê me bi zimanê çekan xeber dide, bi serhildanan xwe îfade dike. Çalakiyên xwefedayî zimanê gelê kurd in.**

Ziman di hebûna gelan de cihekî girîng digire. Ev peyv pir tê gotin û tê bihîstin: “Ger hûn kuştina gelekî bixwazin, berî her tiştî ji kuştina zimanê wî dest pê bikin.” Lewre gel bi zimanê xwe dijîn, bi zimanê xwe rastiya jiyana xwe û rastiya civaka ku tê de dijîn nas dikin. Ziman ji bo xwe îfadekirinê tiştekî bingehîn e. Kedxwar bi zorê gelan ji her alî ve dipêçin, nahêlin ku xwe îfade bikin, bi vî rengî gelan difetisînin. Zimanê axaftinê ji destê wan derdixin. Ev rewş di dîroka pir gelan de xuya ye.

Di rastiya gelê kurd de ev rewş hîn bêhtir eşkere ye. Wexta ku gel dikevin vê merheleyê şiklên nû yên xwe îfadekirinê peyda dikin, rastiya xwe bi hinek riyên din tînin zimên. Di vê derê de em dikarin bibêjin ku zimanê axaftinê rengekî xwe îfadekirinê ye. Bi wateyeke berfirehtir, ziman xwe îfadekirina rastiyê ye, her rastiyekê zimanekî wê heye. Zimanê zarokan, zimanê kalan û zimanê pîrekan ne wekî hev in. Li vê derê mesele ne zimanê axaftinê ye, mesele dil û şexsiyet e. Dilê zarokekî û yê xortekî an jî kalekî ne yek e. Di navbera wan de cudatî hene. Mirovekî karker û mirovekî burjûvazî bi yek zimanî xeber nadin. Nêrîna karkerekî di jiyanê de wekî nêrîna bûrjûvazî nabe. Her kes ji dinyayê tiştekî fêhm dike û bi çavekî cuda li dinyayê dinêre.

Ji xeynî zimanê axaftinê, hinek zimanên din jî hene, rabûn û rûniştin, hal û hereketên me, nêrînên me, heta mîmikên me; hemû rengekî xwe îfadekirinê ne. Ev jî ziman tên hesibandin.

Gelê kurd bi zimanê xwe ango bi kurdî nikare xwe îfade bike, bi zimanê kurdî nikare huner û çanda xwe xurt bike. Nahêlin ku ew bi roman û helbest, bi çîrok û stranan rastiya xwe, êş û elemên xwe, evîn û hêrsên xwe, heskirin, şîn û şahiyên xwe, bi kurtasî dilînên xwe eşkere bike. Zimanê hunerê ji bo gelê me nayê xebitandin, lê em dibînin ku gelê kurd, bi zimanekî din hîn bêtir xurt xeber dide.

Çi ye ev ziman? Ev ziman şer e. Gelê me bi zimanê çekan xeber dide, bi serhildanan xwe îfade dike. Çalakiyên xwefedayî zimanê gelê kurd e. Kedxwar di her alî de çewsandinên mezin çêdike. Gelê kurd nikare bi xeberdanê rastiya xwe bîne zimên, lê çalakiyên xwefedayî dil û mêjiyê gelê kurd vedike, heskirin û hêrs, coş û evîn, êş û elem hemû di van çalakiyan de têne zimên. Ev ziman, zimanekî xurt e, rastiyên gelê kurd bi vî zimanî bi zelalî û vekirî derdikevin holê.

Di van çend salên dawî de, di jiyana gelê kurd de guhartinên mezin çêbûn. Dîroka nûjen û dîroka paşverû di şexsiyeta kurdan de ketine nav hev. Hemû pêşketinên ku di şexsiyeta kurdan de peyda dibin bi saya şer e. Şer di vê derê de dibe zimanê gelê kurd. Rastî bi şer xwe îfade dike.

Di nava zimanê şer û zimanê hunerê de çi têkilî heye? Gelê kurd her çiqas bi zimanekî xurt dixebite jî ev ziman hîn bi huner, felsefe û zanistê nehatiye xemilandin. Niha problem ev e; zimanê ku bi şer derketiye holê, li zimanên din nehatiye wergerandin. Em dikarin bibêjin zimanê zikmakî zimanê şer e, zimanê din zarava ne. Heta ku çalakiyên xwefedayî neyên fêhmkirin gelê kurd jî nayê fêhm kirin. Dema ku gelê kurd neyê fêhmkirin, li ser huner û wêjeyê jî lêkolînên zanistî nayên çêkirin.

Dîroka gelê kurd û rewşa îro ya şoreşgerî ji bo huner û wêjeyê, beşên zanistî yên cuda cuda materyaleke girîng e. Xebitandina vê materyalê encax bi fêhmkirina şer mimkûn e. Pêwist e mirov dilê xwe û gel bike yek.



www.arsivakurdi.org

# Manewiyata Neteweyî Çeka Herî Bikêr e

Manewiyata ku ji evîna gel û welat, ji baweriya bi serxwebûn û azadiyê çêbûye, bi deh hezaran keç û xortên kurd derdixe serê çiyan; wekî Egîd, wekî Bedran û Bêrîtan; wan dike artêşa tolhildanê. Ev manewiyat bi milyonan mirovên kurd bi kesk û sor û zer dipêçe û derdixe hola serhildanan, wan dike Abîdîn û Bêrîvan, ew wekî stêra sibehê, ezmanê Kurdistanê geş dikin.




Gelê ku manewiyata wî ya neteweyî tunebe, ew gel nikare parastina welat, serxwebûn, azadî û tu dozên din ên mezin bike. Gelên bê manewiyata netewayî, tu caran nikarin yekîtiya neteweyî pêk bîne, jiyana wî bêserûber, bêrêzûxet dimîne. Gelên ku manewiyata xwa ya neteweyî winda kiribin, ji bindestiyê re û ji hemû xeternakiyan heta dawiyê vekirî dimînin. Dema di nav gel de behsa manewiyatê tê kirin, ewil dîn û Xweda, Quran û pêxember tê bîra mirovên me. Belê, ew jî beşek ji manewiyatê ne, lê belê manewiyat ne ev bi tenê ne; wateya manewiyatê hîn kûrtir û firehtir e.

Manewiyat, hemû hest, bîr û baweriyan tîne ziman. Hest, hemû evîn, rûmet, dilşewatî, rik, xişm, neyartî, tolhildan, tirs, mêrxasî, gernasî cesaret û canfidayî, bawerî giyan û hwd. yên neteweyî ne. Bîr û bawerî jî, ne kes û tiştên dînî bi tenê tîne ziman; bîr û baweriya bi rizgariyê, bi têkoşîn û zanista rizgariyê, bi serok û şehîdan, bi welat û neteweyê, bi hêza sazî, rêhevaltî û hemû nirxên neteweyî jî heye.

### Mêtinger pêşî êrîşî manewiyatê dikin

Ev hest û baweriyên han, di nav domana dîrokeke dirêj de, di nav têkiliyên hilberînê de çêdibin. Hemû jî bi jiyana bûjenî ve girêdayî ne û li ser vê jiyanê di heş û dilê mirov û gelan de pêk tên. Jixwe dil û zanista netewayî ew bi xwe ye. Lewma, dijminên ku bixwazin miletekî bixin bin destê xwe, mêtingeh bikin û wî bi pişêfînin, pêşî giraniya xwe didin ser têkbirina manewiyata wî miletî, manewiyata wî bela dikin, qedexe dikin û ya xwe dixin şûnê. Di dîrokeke bi dirêjiya hezar salî de dijminan li gelê kurd jî her tim wisa kirine.

Piştî hilweşandina Medya, her çiqas gelê kurd bê rêxistina neteweyî û dûgelî mabe jî, di nav gelên Rojhilata Navîn de dîsa jî xurtiya xwe domandiye. Lewre wî gelî manewiyata xwe ya neteweyî winda nekiribû, hîn manewiyata wî xurt bû, xwe pê pêçabû û jiyana xwe li gorî bîrdoza Zerdeşt dimeşand. Zerdeştî, ji bo gelê kurd kaniya manewiyat û jiyana neteweyî bû, jiyan û manewiyata wî av dida û jîndewar dikir. Jiyana gelê kurd, hetanî serweriya mêtingerên ereb bi vî awayî dom kir.

Mêtingerên ereb, berî her tiştî serê rim û şûrê xwe xistin nav hiş û dilê gelê kurd; manewiyata wî kuştin û qedexe kirin, bîr û baweriya gelê kurd guhartin, rihên wî birin, dest û piyê wî bi benê qederê girêdan û berê wî dane axîretê, jiyana gerdûnî jê re nehiştin; nirxên neteweya kurd hilweşandin, xistin bin lingan û yên erebî xistin şûna wan.

Piştî ku gelê kurd, wiha ji dil û hişê xwe ve jî hate radestkirin, êdî mirovên kurd, her tiştê ereban ji yên xwe bilintir û birûmetir didît. Mirovê kurd, dijminê xwe dost û dostê xwe jî dijmin didît. Çi û kî dijminê mêtingeriya ereb be, mirovê kurd ew dijminê xwe jî qebûl dikir. Lewre, yekîtiya neteweya kurd, azadî, serxwebûn û dewletbûna wî jî dijminê mêtingerên ereb bû. Lewma êdî kurdan bi destê xwe neyartiya doza rizgarî û netewebûna xwe dikirin. Ev rastî, bû bingeha xiyanet, nokerî, û sixuriyeke mezin, bû wekî jahrê û ew bi miletê kurd didan vexwartin.

Lewma vê yekê xiyanet û nokerî li Kurdistan kir awayê jiyanê û ew êdî wekî tiştekî normal hat dîtin. Piştî ku ramana neteweyî hate şikandin, êdî tiştên ku hinek kurd pê kêfxweş dibûn, ew ji kurdê din re dibû sedema xemgîniyê; hinek ji kurdan li dijî mêtingeran berxwedan dikirin, kurdên din xiyanet û nokerî dikirin; hineka ji bo welat xwe gorî dikir, yên din welatfiroşî û sîxurî dikir: Bi vî awayî dijmin yekîtiya neteweyî ya gelê kurd xera dikir.

### Gelê kurd hatibû radeya tunebûnê

Heger ku nirxên neteweyî ji ber mêtingerên ereb filitîbûn, di bin mêtingeriya komara tirk de ew jî hatin şikandin û kuştin. Ji tirsa qirkirinên kemalîstan, tiştên kurdî hatin qedexekirin û vê carê dil û hişê gelê kurd bi haletê mêtingeriya tirk hate ajotin û di bin pişaftineke xedar de tovê tirkîtiyê hate reşandin. Xwestin ku zimanê gelê kurd ji devê wî derxin û zimanê tirkî bixin şûnê. Xwestin ku her kurd xwe wekî tirkekî bibîne, wekî tirkan bibihîze, bifikire û biaxive. Her tiştê bi kurdî hate qedexekirin. Xwestin ku koka kurdîtiyê û evîna Kurdistanê di hiş û dilê gelê kurd de biqelînin.

Hetanî salên 1970'yî, wisa bû ku kurd ji nav û her tiştên kurdî û Kurdistanê şerm bikin, birevin. Mêtingeriya tirk, wekî hûtekî xwînmij neteweya kurdî dimêt û dikuşt.

Hiş û dilê kurd ê neteweyî bûbû taristan. Meydan ji Ehrîmanê kor re vala mabû, di ezmanê Kurdistanê de lotik li xwe dixistin û bi ser Kurdistana delal de êş û jan û mirin dibarandin. Di bin xakê de, di goristanan de hestiyê şehîdan diariyan; bi qêrîna Yekdest, Qazî Mihemed; Şêx Seîdê Kal; Seyîd Rizo pîrê kurda û şêrên welat mêrxasên wekî Alîşêr, qebristan hildiweşiyan... Kurdisana delal xwîn digiriya.

### Bihar ji nû ve dest pê dike

Lê belê di sala 1973'yan de, di kûrahiya dilê kurd de, bi cehdeke dawî, xweliya mirinê ji ser hêviya rizgariyê, ji ser wî agirê di kûrahiya dilan de hate paqijkirin.

www.arsivakurdi.org

Ew hêviya hezar salan bû tovê jiyanê û teqiya, bû ronahî li Kurdistan û karwanê rizxgariyê di bin rêberiya serokê dilovan de bi rê xist.

Belê, dijmin, kurdîtî anîbû ber mirinê, ji bo gelê kurd careke din jîndewar bibe, berî her tiştî jê re manewiyateke netewayî pêwist bû.

Di sala 1973'yan de, bi destpêka têkoşîna serxwbûn û azadiya gelê kurd, serok berî her tiştî bîrdozî û siyaseta rizgariyê afirand û bû seriyekî neteweyî ji gelê kurd re. Belê, serok bi damezirandina Partiya Karker, seriyekî neteweyî, seriyekî hemdem û azad afirand. Ev serî, li zimanê xwe, li guh û çavê xwe xwedî derket; êdî ne bi çavê dijmin dinya dît, ne bi guhê wî bihîst û ne bi zimanê wî axivî. Di serê gelê kurd de bi serok, partî, enî, artêş û şehîdan kanî û robarên neteweyî ji nû ve der bûn, xaka dilê neteweya kurd hate avdan û bihara neteweya kurd tê de hêşîn bû. Dil, hin bi hin ji dijmin û koletiyê, ji xiflet, xiyanet û nokeriyê hatin şûştin û paqijkirin; serî û dil, êdî bi evîna welat, bi evîna serxwebûn û azadiyê, li dijî dijmin bi xişm, rik û tolhildana neteweyî hate tijîkirin.

Êdî xiyanet û radestbûn, nokerî û sîxurî, mîna bêşerefî û bêrûmetiya herî mezin têne binavkirin. Têkoşîna rizgariyê, xebat û canfîdakariya ji bo welat û azadiyê, şeref û rûmeta herî mezin tê dîtin. Dil bi evîna şehîdan hildavêjin û di rêça wan de, di wê rêça serkeftinê de dimeşin; xwe bi rik û xişm, bi hestên tolhildanê dipêçin, xwe dikin bombe û qertikê wî dikşînin, bi ser dijmin de diteqin.

Îro gelê kurd, êdî ji zilmê an ji mirinê nema ditirse, kelayên tirsê ku mêtingeran di dilê wan de ava kiribûn, ji aliyê gerîla ve yek bi yek hatin rûxandin û di şûna wan de ji mêrxasî û gernasiyê kelayên welatparêzî û rizgariyê bilind dibin.

Îro giramî û rûmet ne ji karbidest û serbaz, an ji sazgeh û sembolên dijmin re ye; hemî giramî, evîn hûrmeta gelê kurd, ji serok re, ji al û şehîdên ezîz re û ji hemû xebatkar û şervanên azadiyê re ye. Lewre, gel baş dizane ku hemû tiştên neteweyî û mirovatiya wî, ev nirxên bilind jê re afirandine û pê dane qezenckirin.

Di jiyana gelê kurd de, şer êdî ne li dijî cîran û eşîran, kuştin ne ji bo pez û rezek, an dahl û gezek nan e; pîvan û sedemên şer û kuştinê êdî, neteweyî ne.

### Manewiyat dibe ala berxwedanê

Îro bi deh hezaran şehîdên welat hene, ezmanê Kurdistan ji Ehrimanan hatiye paqijkirin. Keç û lawên kurd, xwe bi evîna welat û baweriya rizgariyê, bi baweriya serkeftinê dipêçin... Carna dibin Mazlun, Xeyrî û Kemal, di rojiya mirinê de dîrhem dîrhem dihelin û mêtingerên faşîst qehr dikin... Carina dibin Necmî, Mahmud, Eşref û Ferhat, wekî çar çira pê dikevin, dijmin dişewitînin. Manewiyat wiha dibe vîneke ji pola û di îşkencexane û zindanan de ala berxwedanê bilind dike.

Evîna welat, di dilê Zekiye, Rehşan, Ronahî, û Bêrîvan de dibe agirê Newroz û dişewite; dibe giyanê Mazlum, giyanê ku Nînova wêran kiribû.

Manewiyata ku ji evîna gel û welat, ji baweriya bi serxwebûn û azadiyê çêbûye, bi deh hezâran keç û xortên kurd derdixe serê çiya; wekî Egîd, wekî Bedran û Bêrîtan; wan dike artêşa tolhildanê.

Ev manewiyat bi milyonan mirovên kurd bi kesk û sor û zer dipêçe û derdixe hola serhildanan, wan dike Abîdîn û Bêrîvan, ew wekî stêra sibehê, ezmanê Kurdistanê geş dikin.

Manewiyata neteweyî, îro dibe Zîlan, Rewşen, û bermal wan dike bombe û bi serê dijmin de diteqîne, tola hezar salan hiltîne û wan dike giyanê erîşê, li ser ala artêşên gerîla wan dike jiyana serkeftinê. Ev manewiyat, dibe Dicle, Emer û Seyran, bi ser xiyanet û nokeriyê de diteqe û jê pirsa sûcên hazar salan dike. Dibe bombe û tixûbên mêtingeran hildiweşîne, birîna niştiman derman dike.

Ev jiyana şehîdên xoşewîst, dibe helbest, dibidestan li ser zimanê gelê kurd û dilê gelê wî de, dibe nav ji zarokên pêçekê re û wan bi daxwaza tolhildanê dilorîne. Manewiyat, mêrxasî, fedakarî û ev cangoriya şehîdan e. Ew ku baweriya gel bi serkeftin û rizgariyê tîne.

Manewiyat, evîn û giramî, rêberî, zanyarî û giyana ku Serok di dilê gel de afirandiye ye. Belê manewîyat, fermane di devê serokê mezin de û li hawîrdorê gerdûnê bi milyonan mirovên kurd radike ser piyan. Ev ferman, dibe eşq, dibe vîn û evîna neteweyî, dibe giyaneke şervanî û gelê kurd dike artêş, wî bi ser dijmin de dimeşîne. Her gotinek dibe xeleka evînê û dilê mirovên kurd di bin ala yekîtiya neteweyî de bi hev ve girê dide. Her gotin û fermanek, dibe bombe, dibe xencer di destê mirovên kurd de û li ser dilê xayinan, li ser dilê mêtingeran dikeve.

### Dema berevaniyê li paş ma...

Gelê kurd îro dikeve dem û pêvajoya desthilatdarî û dewletbûnê. Dema berevaniyê li paş ma, êdî dem dema êrîşê ye. Xak niştiman êdî gav bi gav wê ji dijmin were paqijkirin, wê azad û serbixwe bibe; wê ala neteweyî, ala kesk û sor û zer li ser baweşîn bibe; wê hemî sazgehên neteweyî û desthilatdarî werin damezirandin. Kongereya Neteweyî wê kom bibe, Parlamentoya Kurdistana azad wê biryarên neteweyî bistîne, wê zagon û rêzên neteweyî derxe.

### Dibistanên razanê ji bo pişaftinê ne

Îro dijmin jî xwe li gorî demeke nû amade dike, hêzên xwe didamezirîne û bi çekên xedar dipêçe. Tevî ku mirina wî nêzîk bûye jî, ew jî karê şerên giran û qirkirinên mezin dike. Di vê dema nû de, wê li Kurdistan gundên stratejîk ava bike, wê gelê kurd bixe van gundan, dora wan bi têlên strî û mayînan bipêçe, bi cerdevan û leşkeran parastina wan bike. Dijmin wê ji bo pişaftinê, welatê kurd bi dibistanên razanê yên herêmî tijî bike û dîsa mêjiyê zarokê kurd û dilê wan bidize. Dijmin wê artêşa pêncemîn ya operasyonên domdar û qirkirinên xedar ava bike. Wê walîtiya OHAL'ê dewrî qerargeha vê artêşê bike. Wê çekên teknîk û dijwartir bixe Kurdistanê. Ev diravên bi katrilyonan ku li ser navê perwerdehiya heşt salên domdar dide hev, ev qas zam û şêlandin hemû ji bo pêkanîna vê stratejî û planê ye.

Lewma, divê gelê kurd xwe li dijî vê plana dijmin, bi bîr û baweriya serkeftinê, bi giyana şehîdan, bi manewiyateke xurt ji bo şerê rizgariyê amade bike. Bila were zanîn ku tu çek û hêz bi qasî mirovên zane, ji dil û manewiyat bilind xurt û xedar nabin. Tu hêz nikarin li ber serkeftina mirovên wiha bibin asteng.

ALAATTÎN AKTAŞ

# Divê berjêwendiyên neteweyî bingeh bin

AHMET BARAÇKILIÇ



Raman û liv, teorî û pratîk, jiyana kesan a taybet û jiyana rojane ya bi civakê re di pêvajoka jiyanê de bê guhartin. Ev mijar hemû yek in û bi hev ve girêdayî ne. Tête gotin ku ji hev nayên cudakirin, ev raman divê di hengekî de bên berdewamkirin. Lê mixabin, jiyan û dîrok bi mirovan dide ferkirin ku, ne wisa ye.

Ma gelo ji bo çi em her dem mijara rewşenbîriyê dixin rojevê. Di gelek nivîsan de, di gelek civînên taybet û vekirî de, rewşenbîran rexne dikin, dibêjin pêwist e, rewşenbîr wisa bibin, wisa bikin, wisa binvîsinin. Ji bo çi? Li ser têkoşîna şehîdan, mêrxasên li ser çiyan nanivîsînin. Ev daxwaz di cih de nîn e. Mirov nikare, ji yekî re bibêje, wisa bêje, wisa li ser vê mijarê binivîsîne, pesna vê ramanê bide. Bifikire, bike, bipesine û her wiha, ev daxwaz ji şagirtan re tên gotin, ji mamosteyan re ango ji ronakbîran re nayên gotin. Ger ronakbîr daxwazên gel, êş û hêviya gel nabîne, wê demê ew ronakbîr nîn e. Ger li ser şêran nanivîsînin, mêrxasan nabînin, li ser rovî û mirîşkan dinivîsin, wê demê wan ji wan fêm kiriye, ew ji wan re balkêş in. Divê ji hev baş bête cudakirin.


Di vir de pirsgirêka duyemîn jî raman e, her kes li gorî ramana xwe, difikire, dinivîsîne. Di warê xwedîderketina li neteweya kurd de cudatiya ramanan zêde ne girîng e. Nêzîkbûna ramanekê li ser rewşenbîran neyê ferzkirin. Daxwazên neteweyî û çareserkirina pirsgirêka kurd divê bête parastin, pêşxistin û ronahîkirin. Ji bo vê sedemê, divê doza neteweyî li ber her tiştî be. Pêwist e çîn û ramanên cuda jî di xizmeta neteweyê de bin. Dema ku wisa hat dîtin rê û derî ji her kesî re tê vekirin û tu kes astengiyê nabîne. Gotina kin û sereke ev e ku, mirov li gorî rewşa Kurdistanê, berjewendiyên civakê li partî, rêxistin û saziyan binêre, binirxîne û pê re alîkariyê bike û di nav de cih bigire.

Daxwaz û hêviya me, ew e ku, kurd û kurdistanî xwe binasin, bi zimanê xwe bipeyivin, ji ax û neteweya xwe hez bike. Dema yek welatparêz be, divê ji welatê xwe, neteweya xwe hez bike. Welatparêz divê welatê xwe biparêze û nirxên doza gel bibîne, pêşengiya têkoşînê bibîne, di nav refên neteweyî de cih bigire. Ev doza wisa rêz û dorê xebatek gelemperî ye. Lê divê mirov ji van tiştan yekê bi cih bîne.

Ger kesek van tiştan bi cih neyîne, xwe nenase, nasnameya xwe nebîne, welatparêz û dozparêz nebe, rewşenbîr nîn e. Çawa ku ziman ne tê kirîn ne jî firotin, welatparêzî jî wisa ye. Rewşenbîrî jî ne reng e, ne jî mijar e. Di vir de berjewendiyên neteweyî û têkoşîna rizgariya neteweyî bingeh e. Nakokî û aloziyên çînî û ramanî divê di rêza duwemîn de bên dîtin.

Berjewendiyên kesan, çînan û saziyan li pêş doza neteweyî neyên dîtin. Em kurd ber bi dewletbûnê ve dimeşin. Divê em li gorî saziya dewletê bifikirin û bi tevger bibin. Çerçoveya komeletiyê deynin.

# Şehîdê Dêrsimî embaz Müslüm Solgun



Şerî rew ravêrenê, zey awke herikyenê (akıyor). Weşîna merdiman jî winî ya. Kes finê ewneno ke serî kewtê pêser û merdim kerdo qehan. La belê no qandê şoreşkeran winî niyo, ê (îna) zey astarik tim û tim xoser de manenê û qe vîrî nêbenê. Şoreşgerên ma tenya nê, ê şaran hemin jî winî yê. Ma kurdî hewna newe misayê ke qandê welatê xo bimrê. Coka jî welatperweriya ma hêdî hêdî kewna pay û xo kena rast. Şarê mawo her gi roj qandê welatî guniya xo rijneno. Gerek ma ney rind bizanê. Wa qe kes jî ney xo aqil ra nêvejo. Çend ke ma rûmet bidê weşîn û şahadetê welatperweranê xo, hind jî ma yê çareserê reyayina xo bibê. Qê cayê de jî çiniyo ke, jû welat bêvayê (buha) merdinê welatperweran û şoreşkeran dijmindê xo ra reyayo. Ewro ma de jî dîrok bi na babeta virazyena. Wa na rewş ma nêtersno û wa zerya ma, metîn kiro ke çimê şehîdan akerde nêmano.

Nê şehîdan ra jew jî embaz Muslum Solgûn o. Muslum Zankayê Marmarî de Fakûltê xeftiyayinê Aborî de wendox bi, û şarîstanê Dêrsim ra bi. Stenbol de sera 1990 de wendoxê ke welatperweriyê û zankeyan de waneyê, ê zaf çapik bî. Her gi roj cayê de serwedarneyî virastê û ters dayê Romî. Ek zankeyan de, ek kûçan de werištê pay û biyê vengê şoreşê ma kurdan. Coka jî ters o gird kewt bi pîzedê roma reş. Embaz Muslum, ê rojan de bibi lacê adirî û tim û tim vernî de zerî dayê embazanê xo. Kamcîn rojname de weneyê, ê serwedarnan vejyayê, Embaz Muslum tede asebiyê (miyande vînyayê). Jû, jû fin embazan ci rê vatê: "Embaz to fina xo asekerdo (aysnawo) ha. Nê nê embaz sûcê to niyo, çi rê ke, tiyê erdîşinê û tayn jî çapikê rojnamegerî jî ay ra weneyê to ancenê." Nê kuşatan ser, ey jî wina vatê: "Bewn embaz, wexto ke ma lecî de kewnê pê miyan, ez jî ê teşxelî de xo çekena rojnamegeran ver, ê feqîrî jî çinêbîn ra weneyê mi ancenê. No jî erbabîna min o."

Piyê ci wexto ke o werdî biyo merdo. Goreyê zaneyina ma, dedê ci herûna piyê ci (cayê) pirkerd bi. Jû fin şiyê didê xo hetek û ci ra perey girotê. O senî ke ameyê embazanê xo hetek, pereyî oca (wija) de kerdê vila. Ey de qe çiyê jî nimite nêbî, çiçiyê ci est bi embazanê ci zanayê. Ma hemin ra veşî ci rê perey ameyê, la belê o tim û tim jî bêperey mendê. O embazanê xo miyan de zaf barakerd bi. Kişta barakerdin ra kes jî ey ser ra çinêbi. Rojê fina teber ra newe ame bi ke, jew embaz qahriya û ci ra vat:" Ti kotî de mendê? e şefaq ra yo ezo to pawena. Ezo wazena ke şirî cayê, la belê perey mi de çiniyê, to perey ardî nêardî?" Embaz Muslum tenekê sist bi û wina vat: "La wili kêberdê yûrdî ver de ez raştê jew embazî ameya, çiçî ke mi de, est bi, mi day ey. Xora veşî jî nêbî, fina jî mi daye ê embazî." Çimê embaz Muslum zaf hera û dest akerdê bi. Ez vana o seranserê weşîna xo de barakerde bi.

Fakûltawa ke embaz Muslum wendoxê ci bi, tede vêşî welatperwerî çinêbî. Ek raşt yeno min vîrî, panc şeş wendoxê welatperweriyê oca de est bi (wija de bî). Wendoxê faşîstî na fakûlte de veşî bi. Wexto ke jew, di embazî nêşiyê fakûlta embazê bînî jî nêwaştê şirê. La belê Muslum winî nêbî, ey faşîstî çiyê jî nêhesibnayê û çi wext ganê ci waştê şiyê fakûlta xo. O wext jî embazan ci rê vatê: "Embaz ti qandê çiçî wina kenê, wexto ke ti şinê ma rê vaji, ma jî bêrim. Ek kutikî to tenya bivînê, iyê xayiniya çiyê biyarê to sere. Ma pahesyenê ti şiyê kampus, wina nêbeno embaz." Nê giliyan ser, embaz Muslum wiyayê û wina vatê: "Ek zey şima bo gerek ez ling nêçekerî teber. Weşîn berz û hera yo, kamî ra û kotî ra çiçî yeno, wa bêro. La wili bîli şima nê kutikan zaf kenê gird, ê nêwetanê şirê meyitê ma ser. Qey ke şima nêzanê ma kamiyê û ê kamiyê, înan de o camêrdin esto ke bêrê ma ser û ma rê çiyê vajê. Fina jî ezo xo pawena û çimanê xo înan ra nêabirnena. Şima qe mekewê qaxidê min."

Embaz Muslumî jî zey qeçê adiriyê bînan, rojê biryarê xo da û şi welatê ma Kurdistan bi şoreşgerê azadî. Çi heyf o ke veşî weş nêmend. Sera sifteyin de hîrisê rezberî (îlonî) de mabêndê Botan de jew vardayin (êrîş) de şehîd kewt. Ewro mayê vînayeyê (şahid) ke jewo ke dêrsimij o Botan de, jewo ke botanî yo Serhad de, jewo ke serhadij o Amed de şehîd kewno. Ez bawer kena ke şarê ma yo, pêriko jî nê rewşî vîneno. Şar werişto pay û çahar kiştê welatî de beno jew û iyê şopdê qeçenê (domananê) xo de benê raşt û zerya vila, (dağınık) anê pêser. Ancî Başûr û Bakur, Rojhilat û Rojavayê welatî Amed de zerî çekenê. Lepê şoreşgero dêrsimij Embaz Muslumî, Botan de sifetê bandorkaran de zey gula sûr teqê û ewro jî seranserê welatê de berz beno, û zerya ci jî Amed de erzeno. Çirê ke Amed zerya reyayinê ma yo.

ZÜLKÜF KIŞANAK

www.arsivakurdi.org



BÛYERINE JI DÎROKÊ

● **27.09.1997:**

Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) ji bo ku çand û nirxên kurdan ên ku bi sedsalan hatine binpêkirin, talankirin derxe ronahiyê û pêş ve bibe, di sala 1991'ê de ji hêla hinek rewşenbîrên kurd ên wekî Musa Anter, Ali Temel, İbrahim Gürbüz, Süleyman Danışman û hwd. li Stenbolê hate damezirandin.

● **28.09.1996:**

Girtiyê PKK'yî Vedat Aydemir ji bo protestokirina qetlîama li Girtegeha Amedê ku 10 girtî bi aweyekî hovane hatibûn kuştin, xwe di Girtîgeha Bayrampaşa ya Stenbolê de şewitand.

● **28.09.1994:** Delegeyê HADEP'ê yê Yüreğira Edeneyê M. Salih Sabuktekin li taxa 19 Mayısê ji hêla kontrayan ve hate şehîdkirin.

● **28.09.1970:** Serokê Mısırê Cemal Abdulnasir çû ser dilovaniya xwe.

● **29.09.1902:** Emilê Zola mir.

● **01.10.1996:** Kovara edebiyat, şiîr û hunera kurdî, Jiyana Rewşen li Stenbolê dest bi weşanê kir.

● **01.10.1946:** Komara Gel a Çînê di bin serokatiya Mao Zedûng de hate damezirandin.

● **02.10.1952:** Li cîhanê roja zarokan hate pejirandin.



# Xelatên pêşbaziya çîrokan hatin dayîn



Roja 21'ê rezberê li NÇM'ya Beyoğlu xelatên kesên ku di Pêşbaziya Kurteçîrokan de bi ser ketine hatin dayîn. Ev pêşbazî ji hêla Beşa Sînemayê ya NÇM'ê ve hatibû lidarxistin.

Merasîma xelatdayînê bi axaftina Berpirsê Beşa Sînemayê ya NÇM'ê Kazım Öz vebû. Öz di axaftina xwe de bal kişand ser giringiya wêje û çîroknivîsînê û diyar kir ku wê pêşbaziyên bi vi rengî di salên pêş de zêdetir bibin. Ji aliyê din ve Öz daxuyand ku çîrokên ku ketine destê wan bi giştî li ser şer in û ev yek jî bandora şerê qirêjî li ser gelê kurd bi awayekî zelal xwe diyar dike. Kazim Öz axuyand ku ew dixwazin vê pêşbaziyê di salên pêş de bikin pêşbaziyeke kevneşopî.

Di dema dayîna xelatan de jî, xelata kesê duyemîn Sînemavan û endamê jûriyê Huseyin Kuzu da. Wî jî li ser naveroka çîrokan û wateya pêşbaziyan dîtinên xwe anîn zimên. Kuzu da zanîn ku dema wî çîrok xwendine dîtiye ku ew bi berhemên berî ronesansa kurdî re rû bi rû ye.

Her wiha Senarîst û Nivîskarê Sînemayê Semir Aslanyürek jî wekî endamê jûriyê axaftinek kir. Aslanyürek bi gotina helbestvanekî ereb da zanîn ku "kurd heyfa xwe ji qederê hiltînin" û got: "Min digot ezê karibim xwe ji xwendina hinek çîrokan bidim alî, lê piştî ku min dest bi xwendina çîrokan kir, min dît ku ew yek ne pêkan e."

Di vê pêşbaziyê de balkêştirîn xal pirbûna çîrokên ku ji girtîgehan hatibûn. Ji mêvanan, Gerinendeyê Giştî yê Ülkede Gündemê Erdem Önal di axaftina xwe de li ser vê yekê rawestiya û da zanîn ku, her çiqas ev însan di navbera çar dîwaran de bin jî afirîneriya wan nayê berbendkirin.

Xelata xwediyê çîroka ku yekemîn hat, ji hêla Serokê NÇM'ê Nuray Şen ve hate dayîn. Wê jî axaftineke kurt kir û li ser giringiya xebatê rawestiya. Nuray Şen bi bîr xist ku di salên heftêyî de hebûn û nebûna kurdan dihat nîqaşkirin, lê îro gelê kurd ji serdema ronesansê re amade ye.

Berhemên ku xelat wergirtine û nivîskarên wan: 1) Günlüğümden Veysi– ji Enqereyê Tolga Ersoy; 2) Buz ve Alev– ji Enqereyê Mehmet Maden; 3) Acılı Dostluk– ji Çorumê Hasan İpek.

Xelata jûriyê ya taybet: 1) Kaybeden Kaybedecek– İzzet Baykal ji Girtîgeha Bartinê; 2) Götürün Bu Kadını– Huseyin Acar ji Girtîgeha Aydinê; 3) Yanan Gün– Burhan Babaoğlu ji Girtîgeha Bartınê.

Xelata teşwîkê sê berhemên bi kurdî girtin: "Agir ji dil bû"– Çiya Mazî Mêrdîn, "Tolhildana dîrokî û Evîndariya mezin"– Î Halil koser Ceyhan; "Serfiraz" Umur Hozatlı.


Piraniya xwediyên xelatan ji ber hinek egerên taybet, nikaribûn beşdarî vê merasîmê bibin. Li aliyê din bi hev re nirxandina berhemên kurdî û tirkî wekî çewtiyekê bal dikişand. Wêjeya her gelî divê li gorî rewşa wî bê nirxandin. Lewre jî diviyabû berhemên bi kurdî bi awayekî serbixwe bihatana nirxandin.

Piştî xelasbûna xelatdayînê Koma Amed konserek da beşdaran.

SERWÎSA ÇANDÊ

## ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÎĞÎT



### Xayintiya 31'ê gelawêjê

Gelawêja bihurî, di 23'yê mehê de, ji bo semînerekê bi du hevalan re em li paytexta Norveçê li Osloyê bûn. Ev semîner bi giranî ji bo kurdên Başûr û Rojhilat bû. Dabaş şerê di nav xiyanatê û tevgera rizgarîxwaz de bû helbet. Hefteyekê piştre 31'ê eynî mehê vê carê li serbajarê Swêdê li Stockholmê, bi munasebeta salvegera roja ku PDK Sedam vexwend Hewlêrê, semînerek din hate lidarxistin. Vê carê ji aliyê Navenda Rewşenbîrî ve ku nêzîkê Yekîtiya Niştîmanî ye. Di semînera duyemîn de hejmara semînerdaran zêde bû. Beşdar ji her aliyê welêt bûn. Nûnerê ERNK, yê PSDK birêz Xwurşîd, Şêrko Bêkes, Selah Muhtedî, Emer Şêxmus, Nûnerê Partiya Zehmetkêşan Heme Awet, ji Rojhilat Ehmed Skenderî, ji Başûrê Biçûk nûnerê Partiya Çep, çend kesên din û ez jî hebûm. Piraniya semînerdaran li ser "reh û rîşeyên xiyanetê û li ser lewaziya hafize û bîra neteweyî" sekinîn. Li vir "sebeb çi ne ku em di vî alî de ne kûr in, rola xwenda û rewşenbîran çi ye û çend e" hatin munaqeşekirin.

Gava mirov bala xwe dide dosya xayintiyê, hinekî lê hûr dibe, ber bi îro dikeve pey şopa wê, mirov dibîne ku sal bi sal mezintir bûye, heşkeretir û bêşermtir bûye û bi Mesûd Barzanî re gihîştiye sînorên xwe yên dawî, cih û kerteke ku hew jê wirdetir heye. Bi gotinin din bûye desthilatdar, bûyê hêzeke organîzekirî, xwedî çek û rêxistineke berdewam. Ev pelekî nû ye di vê dosyayê de û ev pel gelekî xweser e. Mesûd 31'ê gelawêja 1996'an paytexta Başûrê Kurdistanê xiste bin potînên Sedam û ji 14'ê gulana îsal û vir de jî mil di milê dewleta tirk de li dijî şervanên tevgera rizgarîxwazî şer dike. Di nav neh mehan de carekê bi qesabê Kurdistanê re û yekê jî bi bavkuştiyên gelê kurd re dibe yek û li baştirîn lawên gelê kurd dide.

Di nav xayintiyên 200 salên dawî de çu xayintiyek nikare lingên xwe li yên 31'ê gelawêjê û 14'ê gulanê bide û ne mimkûn e ku mirov karibe pê re muqayese bike. Di çend rêzan de em dikarin dîtinên piraniya semînerdaran kurt bikin.

Ya yekê divê em navên tiştan bi rastî li wan bikin. Em nekin dê tevlihevî û sergêjî nesekine û em dê çewt û rast ji hevdû dernexin, em dê ji bo me çi zerer û çi na, nas nekin. Qencî û xêra me vê dixwaze. Siyaseta rast û cidî vê dixwaze. Navandina rast, alfabe û gava yekemîn e ji bo çareserkirina pirs û pirsgirêkan. Navê nexweşiyê divê lê bêkirin. Ku nav lê bû, dermankirin divê. Tiştên ku PDK di 31'ê gelawêjê û 14 gulanê de kirin wiha ne. Kes di xayintiyê de nabihure. Nabêjê "de xem nake, xeletiyek bû û çû" kurdên li Swêd û Skandînavya giş nebin jî, beşek mezin ji wan serpêhatiya Sitig Bering zanin. Qusling jî nimûneyeke din e li Norwecê.

Pirsa duyemîn helwestgirtin e. Helwestgirî di nav me de, nemaze di nav rewşenbîran de kêm e. Ev jî sebeba serekî ye da ku em û xayintî bi hev re bijîn û em hînî hev bibin. Helwestnegirtin sersarî û bêxemiyê dike jiyan û felsefe. Bi vê re jî belayeke din dixuliqe û malkambaxiyeke din tê. Ew jî qelsketina hestê berpirsî û mesûliyetê ye. Ev hest diqurmiçe, arqozkî û belexwarî dibe. Yeke çarem jî heye: Hafize û bîra neteweyî çênabe, tiştê heye kûr nabe. Duh û îro ji hev qut dibe. Mêjî û hişmendiyeke dîrokî nayê pê. Ev bi hev re dibin zemîn û mextela bişax û perbûna xayintiyê û dubarebûn û çendcarbûna wê.

www.arsivakurd.org

## Hevalê Cegerxwîn, helbestvan

# Helbesta ku mirov nehejîne, ne helbest e

*Seydayê Tîrêj hûn dikarin bi kurtî ji xwendevanan re çîroka jiyana xwe vêbêjî*

● Belê, navê min Nayifê Kurê Heso ye. Ez di sala 1923'yan de hatime dinyayê. Li Cizîrê gundê Nicip, piştî heft salên min qediyane min çend pirtûkên şerîetê xwendine, di pişt re sala 1938'an de ez çûme dibistana Amûdê, min pênc salan di wê dibistanê de xwend û dû re têkiliyên min bi Partiya Xoybûn re çêbûn û ez bûme endamek ji wê partiyê bi Seydayê Cigerxwîn re, bi Qedrî Can re, bi Hemza Begê Meksî re, bi van hevalên xwe re min kar dikir di nav Xoybûnê de.

*Seyda di navbera dîwana we ya yekemîn ku di sala 1952'an de çapbûyî û ya duyemîn ku di sala 1992'an de çapbûyî de çil sal derbas bûne, hûn dikarin sedemên vê yekê bibêjin?*

● Min di sala 1938'an de dest bi honandina helbesta kiriye, heta sala 1950'yî min dîwanek çêkir. Di wê salê de ez hatim girtin, dîwana min a yekemîn hate girtin, di navbera vî çil salî de karbidestên dewletê gelekî li min digeryan û carina ez dikirime zîndanan.

Ez rabûm min bar kir nav ereban, di wir de hinekî helbestên min kêm bûn, gerek di çil salî de min sê dîwan çêkiribûna, lê ji ber vê yekê helbestên min kêm bûn. Di pişt re ez hatim Hisiça û careke din min dest bi nivîsandina helsebtan kir, a niha sê pirtûkê min hatine çapkirin û didu li ber çapê ne. Navê pirtûkeke min "Serpêhatiyên Kurda" ye.

● Her ku bûyereke mezin li Kurdistanê çêdibe, Seydayê Tîrêj bi lez li ser helbestan dinivisîne, wekî dalegandina Leyla Qasim, ketina şoreşa Barzanî, mirina Barzanî... Çima ev lezandin?

Dema ez helbestan dinivîsînim, ez di rewşa nuhok de çêdikim, helbestên min hemdemî ne, ez ne berî çil salî çêdikim, em tev di pêşketinê de ne û helbestên min jî wiha ne.

*Heger ku bûyer derbas be dikare xweşik lê binêre, ji ber ku di bûyerê de her tişt ne xuya ye?*

● Ê min di dema bûyerê de helbest di hundirê min de dikele û bi xwe derdikeve, ma ku bûyer derbas bû, wê helbest çi sûdê bide, divê di bûyeran de helbest bê nivîsandin ta ku sûda wê hebe, tu dibînî helbestên ku min li ser qehreman û zanyarên kurdan gotine, li ser bûyerên ku li Kurdistanê çêbûyî tev di dema wan de ne. Piştî ku dem di ser helbestan re derbas bibe ew dibine jêmaye, lê helbest xweş in di demên xwe de, di germahiya bûyeran de. Bi min re wan deman zû helbest derdikevin, lê carina ku bûyer tunebin, di biharê de kulîlk li ser rûyê erdê vedibin û wiha bêhna min jî ji helbestan re vedibe.

**Di dema bûyerê de helbest di hundirê min de dikele û bi xwe derdikeve, ma ku bûyer derbas bû, wê helbest çi sûdê bide, divê di bûyeran de helbest bê nivîsandin ta ku sûda wê hebe, tu dibînî helbestên min li ser qehreman û zanyarên kurdan gotine, li ser bûyerên ku li Kurdistanê çêbûyî tev di dema wan de ne.**

*Tore û wêjeya kurdî tu di van dema de çawa dibînî?*

● Di dema Cigerxwîn de rehma Xwedê lê be, toreya kurdî gihîşte asoyên bilind, lê a niha em dibînin dadikeve.

*Tevî ku gelek pirtûk jî a niha tên çapkirin jî?*

● Tevî wê jî, ji ber ku helbestek li hemberî dîwanekê ye di van dema de, helbestvan pir bûne, hinek helbestên vekirî jî çêdikin, bê movik îcar ev jî helbest in..! Ev ne helbest in, helbest divê mirovan bihejîne û heger ne wiha be, ne helbest e.

*Hinek rexnegirên ereb dibêjin pêwistiyên jiyanê hiştin ku ev helbestên nûjen çêbibin, ango jiyan hate guhartin divê helbest jî bêne guhartin?*

● Na ne bi gotina wan e. Ji ber ku nivîskarê erebî yê mezin Taha Huseyin gotiye: "Helbestvanên me îro tiştekî nû neanîne." Evên ku helbestên vekirî çêdikin ji wan nayê ku helbêstên klasîkî bi kêş û pêlawaz çêkin ji ber vê dibêjin helbestên klasîkî ne baş in, bera (bila) ewhelbesteke vekirî çêkin, ez ji wan re têxime kêş û pêlawazê.

*Hûn helbestên kurdên Sûrî çawa dibînin?*

● Bersiva vê pirsê min ji Celîlê Celîl re got. Ez û wî û hinekên din em li hev kom bûn û me helbest gotin, wî got: "Helbestên kurdê Sûrî gelekî xweş in." Min got: "Celîl tu me kurdên Sûrî hindik dibînî, lê em bi zanîna xwe gelek in." Min got çiyayê Şengalê çiyakî biçûk e, tu dibînî baz û kewên wî bi nav û deng in û ji bilî vî çiyayî ji çiyayên bilind û mezin hene wekî Ararat, Sîpan, Cûdî û hwd. li ser wan jî tilûr hene, lê ne wekî yê Şengalê bi nav û deng in.

*Gelek kelem li pêş belavbûna toreya kurdî di nav gelê kurd de û di nav gelên cîhanê de disekinin, wek tunebûna zimanekî yekane û xweser, hûn vê yekê çawa dibînin?*

● Îro zimanê xweser û yekane yê Behdînanî ye, tu dibînî piraniya gelê kurd bi vî zaravî diaxevin. Kurdên Tirkiya, her wiha kurdên Sûriya û nîvê kurdên Iraqê û zaravên din kêm pê diaxivin . Heger ku zanîngehên me çêbibin û li ser rawestin, wê yekîtiya ziman çêkin. Îro ezê bi zaravayê xwe bêjim û bira yê Sûriyeyê jî bi zaravê xwe bibêje.

*Ji toreya cîhanî tu ji kê re dixwînî, an tu helbestên kîjan helbêstvanî xweş dibînî?*

● Toreya cîhanî wekî baxekî gulan e, em jî di nav re darinan bêhn dikin, asoyên me bi wan fireh dibin, zanîna me bêhtir dibe, di toreya erebî de ez helbestên Îmri–ûl Qeys xweş dibînim, Nebîxet El Zubyanî, Firezdeq, Beşar bin Burd, Ebûl Ela el Mîerî...

*Têkiliya we bi Seydayê Cigerxwîn rehmetî re çawa bû?*

● Di ciwaniya wî de em bi hev re bûn, ji sala 1938'an ta sala 1978'an ku ew çû Swêd. Dema min helbestên xwe çêdikirin min dianîne ba wî, îcar pesnê min dida û destê xwe li pişta min dida û digot: Tuyê bibî helbêstvanekî mezin.

*Seydayê Tîrêj we pir caran di helbêstên xwe di li ser jînê nivîsandiye, hûn jînê çawa dibînî?*

● Jîn pir xweş e ji mirovên zana û têgihiştî re. Hinek dibêjin xweziya ez

www.arsivakurdi.org

# ê bi nav û deng Seydayê Tîrêj:



**Hinek dibêjin xweziya ez çênebûma ji diya xwe, çima dibêjin, ew bêkêr in, ne bi kêrî dinya xwe tên, ne bi kêrî axreta xwe tên. Lê mirovên qenc bi kêrî dinya xwe jî tên û bi kêrî axreta xwe jî tên. A niha temenê min bûye heftê û çar sal ez dixwazim heftê û çar salên din jî bijîm, ji ber ku ezê xizmetekê ji milêtê xwe re bikim, di dû re jîn xweş e...!**

çênebûma ji diya xwe, çima dibêjin, ew bêkêr in, ne bi kêrî dinya xwe tên, ne bi kêrî axreta xwe tên. Lê mirovên qenc bi kêrî dinya xwe jî tên û bi kêrî axreta xwe jî tên.

A niha temenê min bûye heftê û çar sal ez dixwazim heftê û çar salên din jî bijîm, ji ber ku ezê xizmetekê ji milêtê xwe re bikim, di dû re jîn xweş e...! Jîn ne bi peran e, carina heqê nanê min tune ye li ez li ber nakevim, penc weraqe di berîka min de bin û pênsed hezar be wekî hev in, ji mirovê qenc re jîn xweş e û ji yê bêkêr re ne xweş e, va ye min sê dîwan jî milêtê xwe re çêkirine û didu jî li ber çapê ne, ezê bikim pênc û heger temenê min zêde be ezê bikim şeş û heft jî, ma jîn xweş e, lê ne xweş e...?!

Ku wiha be jîn xweş e (Tîrêj bersiva xwe berdewam dike) Çima tu ji Kobanê hatî ba min, ma bavê min ji bavê tê mezintir e...! Di dema pêşîn me dest pê kir, em dihatin civata me silav dikir, kesî silava me venedigerand bi çavekî kêm li me dinêrin, lê me berdawam kir, me zanibû rewşenek li pêş me heye û ev tiştê me çandî emê rojekê biçinin jî, îroj ez diçinim, îroj ji Almanyayê, ji Rûsyayê têne ba min, dibêjin em jiyan û helbêstên Tîrêj nas bikin.

*Seydayê Tîrêj tu dikarî helbestekê diyarî xwendevanan bikî?*

### Ne bi çûna teresî

*Dîlber hate civan im, bi kerasê melesî*
*Pir bi dîdarê vê şa bûm, dil jî kêfa reqisî*
*Xanî û hindir li min bûne wekî mûm û fener*
*Ro ji hêla reş bi derket, ku cîhan pê çirisî*
*Wê bi nazî roj bixêrek daye min, vê re kenî*
*Go min pir bîrya te kiribû, ez te nadim bi kesî*
*Min digotê ser ser û çavan tu hatîbêdewê*
*Dil ji ber eşqa te bûye wek kulîlka çilmisî*
*Qet nema koka dirana tev ji nanê repisî*
*Va di kuncên tarî û reş de, bi xwe winda me ez*
*Bilbilê mest û hezîn im, girtiyê der qefesî*
*Lê bi dîna te li min dinya dibe mêrg û bihar*
*Wek ciwanê çarde salî tu ji bo min hewes î*
*Ka berî mirina xerabmal destê xwe bi mi da*
*Em biçin Laleş tewafê ger te êzît peresî*
*Em li çar goşeyê Kurdistan bikin seyrangehê*
*Meye emrê min di gerdûnê de tu tim peresî*
*Ta di gorê de nebî hesret bi min dîna welat*
*Merheba wê gav bi dojê, ne bi çûna teresî*
*Ez bi bîr û bawer im, dojeh li min ê sar bibît*
*Rengê Îbrahîm kurê Azer bi germê nehisî*
*Agirê Mûsa li seynayê dema şewqê veda*
*Terh û dar û şah ne sotin, ne ji pela rewisî*
*Yê ne aşiq be ew bê pare li dinê û axretê*
*Ez bi kurmancî dibêjim, ne bi zarê çerkesî*
*Rengê Tîrêj ta li ser pêta evînê dil neso*
*Şerme jê re, dil ne caw e ku bidî ser meqesî.*

Di dawiya vê hevpeyvînê de ez ji we re spas dikim û temenekî dirêj ji we re dixwazim.

(Bi ken gote min) Tu dixwazî heger Xwedê jî bixwaze baş e, ez jî her dem kêfxweş im bi dîtina we.

HEVPEYVÎN: BÊZAR KOBANÎ



www.arsivakurdi.org

# Ji bexçeyê helbestên soranî du gul



**Mihemed E. PÊNCEWÎNÎ** di sala1944'an de li başûrê Kurdistanê, li bajarê Pêncewînê ji dayik bû. Piştî ku perwerdehiya xwe qedand, ji sala 1970'yî heta sala 1990'î li Başûr karê rojnamegerî û nivîskariyê kir. Pêncewînî di vê demê de di Hewkarî, Karwan, Beyan, Roja Kurdistan de xebitî. Nêzî 15 sal e jî li ser wêjeya kurdî dixebite û di vê demê de; pirtûkên bi navê Çiya Ferşî Çerbeze ye, Tezûyî Raz û Niyaz, Geldibête hemoglobîn, Girêjêne, Reş û Spî, nivîsandine. Ew endamê Komîsyona Çand û Perwerdehiyê ya PKDW'yê ye.

**Nahîde HUSÊNÎ,** yek ji şaîrên nûhatî yên jinên kurd e ku niha dikare wekî helbestvanên kurdan ên mêr di warê edebî de bixebite. Nahîde Xanim di sala 1967'an de li rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Piştî temamkirina xwendinê zewiciye û niha du zarokên wê hene. Wê pêşî helbestên xwe bi farisî dinivîsandin, lê niha bi kurdî dinivîse û şul û xebatên edebî ya wê pir baş e. Nahîde xwişka şaîra hêja Jîla Husênî ye ku ew jî yek ji şaîrên Rojhilat bû. Nahîde helbestên xwe bi zaravayê soranî dinivîse.



***Çend nimûne ji şiîrên M. Emin Pêncewînî***

### Qereç!

*Lem rojane da*
*qereçekim dî*
*rût û recal*
*bê zewqewe pê ekenî*
*ke lêm pirsî*
*tu xelkî kiwêtî?*
*le kiwê hatuy*
*bo kiwê eçît?*
*paş hepesan*
*ruy kirde zemî û asman*
*wutî: Netewe Yekgirtwekan*
*daniyan be mafî min naw*
*xistimyane naw lijneyêk*
*erê ey tu?*
*miniş tasam*
*xecalet bûm*
*ziman lal bû nehate go*
*her çendim kird nehate go*
*êstaw ewsaş nehatî go*

(1979)

### Gil û mindal

*Ke min be ser xumma ekird*
*mêşk û bîr û xwên û dilim*
*her le gile û her bû gile!*
*ke wa bû xak yanî 'min' e û*
*miniş wate, xak û gil im!*
*Çûme mektep, pêyan wutim:*
*xol xwardin hergîz baş niye,*
*belam karî siruştî ye*
*ebêt wa bê*
*Çunke miniş gil û xak im*
*alûdeyîm û lêy bê bak im!*
*bûye êste her koluyek*
*ke lem xake da etaşrê,*
*birînêke le cestema...!*
hertaşeberdê ebarê
hezaran lêwî xemgîn e
êsk û pirosk, xwênî dile û
"Mem"î çend, "Zîn" û Şirîn e...!
tomarêkî êgcar gewrey
mêjuy pirr karesatî jin e...!
awezekî gelê çiro
zar be çûşe le bestema...!
eger êsta
minalekanim gil bixun...!
bê qure sure çaw bişûn, rûyê xwe bişûm
pêyan elên deknoştan bê
destan rengîn
ta xoşewîstî niştîman
ta gil û xulî Kurdistan le gel
xwêntan têkel bê..!
bête madey "Hemoglobîn"!!
le naw diltana gewre bê...!

***Çend nimûne ji şiîrên Nahîde Husên***

### Jiwan

*Ewro hatim bo cê jiwan*
*miştê xol û miştê awing xelatim bû.*
*Ser heldebirim*
*asman degirî*
*xoy be tawanbar dezanê*
*Perdey hewrêkî şînborî*
*be ser xoy da dakêşawe û*
*nim awingêkî asman*
*pêlwekanî ter kirduwe*
*Le cê jiwan da gîrsamewe*

*Celadêk hat*
*korpeyekî sar û sirî nayekoşim û*
*qefey qijî xwênawîşî*
*alande dest û gerdinim*
*Emro hatim bo cê jiwan*
*zerdexeney ser lêwî to*
*hawarêkî eycgar berz bû*
*pir be dolî tenyayîman*
*zirîkandî*
*Taze dîdarman kewte qiyamet*

### Yad

*Tu firmêskî ew mumey wa*
*be yadî tuwe damgîrsan*
*Tu ew bayey gir û kilpey dilî minit*
*le gel xo birde henderan*
*Min be yadî tu û eşqeket*
*bergey xemî dûrît degirim*
*le hanese kanima dejît*
*Çawî yadî tu maç dekem*
*dest xerîbî û tenyayît*
*degirme nêw pencekanim*
*Tu balindey dilêşawî*
*torawî nêw henderanî*

### Kat

*Kat çokî şika*
*Hawar*
*Le qorgî sikala da qetîs ma*
*Asman*
*bêtirûske şelalî şew bû*
*Çem bêdeng e*
*Şew ba*
*Şeket*
*Le ser singî şerge*
*şemare deka*
*Zewî*
*al girt û henase nada*
*Şeqamî mon be seriya şetek dirawe.*

Amadekar: Ehmed Şerîfî



www.arsivakurd.org

**Çalakî**



Li navendên çandê, çalakiyên vê hefteyê
Li Navenda Çanda Mezpotamya ya Stenbolê
● **27.09.1997 Şemî:** Konser-Kızılırmak û Nevzat Karakış, saet: 14.30
Genç Ekin S.M.Tiyatro: Tiyatro Ateşî "Savaş yada Barış (Şer an jî aştî)", saet:18.00
● **28.09.1997 Yekşem:**
Çalakiyên Şeşemîn Salvegera NÇM'ê
Muzîk–Şano–Sînevîzyon
Yekîtiya Malbatên Mezopotamyayê: "Ji xwarinên kurdî çend mînak", saet:15.00

Li NÇM'ya Îzmîrê
● 27.09.1997 Şemî: Xwarin
Konser- Hozan Cezmî
● 28.09.1997 Yekşem
Çalakiya Şeşemîn Salvegera Damezirandina NÇM'ê
Folklor- Koma Şengal, saet: 14.30
Konferans: M. Zahir Kayan, saet: 18.00
"Sanata Yaratma û Îmge"

**AWIR**

# Antonio Tabucchi li Tirkiyeyê bû



Nivîskarê Îtalî Antonio Tabucchi ji bo demeke kurt hate Tirkiyeyê. Nivîskarê bi nav û deng Tabucchi li Stenbolê bi mebesta naskirina nivîskarên li Tirkiyeyê roja 22'ê rezberê li Navênda Çanda Îtalî kokteylek û civîna çapemeniyê li dar xist. Nivîskarê Îtalî di warê ravekirina peywira wêjeyê de jî bal kişand ser girîngiya "guman" ê. Nivîskar Tabucchi da zanîn ku ew ne alîgirê edebiyateke ku li bersivan digere ye, lê belê alîgirê edebiyateke ku pirsan dipirse ye. Her wiha Tabucchi xwe wekî matematîkzanekî ne, lê wekî hunermendekî bi nav dike. Nivîskarê îtalî Tabucchi di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku îro gelek tiştên ku rastiyê bi mirov didine gotin, hene û ev tişt hem ji bo polîtîkaya ku dinyaya me dagir kiriye û hem jî ji bo medyayê derbas dibe. Li gorî dîtina Tabucchi li dijî van rastiyên xapînok û çewsîner peywira edebiyatê ev e ku di mêjiyê mirovan de tim cihekî taybet ji "gumanê" re terxan bike. Li gorî Tabucchi divê edebiyat, derbasî pişt dîwaran bibe, tiştên veşarî derxe rastê û nîşanî mirovan bide. Lewre medya her tiştî rasterast pêşkeşî mirovan nake.

Ji aliyê din ve Antonio Tabucchi diyar kir ku wî dema ku Barlosconî hatiye îktîdarê bi şêweyek tûj rexne li Berluscanî girtine, bi zimanê nivîskarekî. Lewre divê edebiyat derbasî aliyê din yê rê bibe, edebiyat hewce nake ku bi medyayê re pêşbaziyê bike. Divê edebiyat ziman û metodên medyayê bi kar neyîne. Lewre têkiliyeke cîhê ya edebiyatê bi cihanê re heye.

### Pereira îdia dike

Roja 23'ê rezberê galaya fîlmê ku ji pirtûka Antonio Tibucchi hatiye girtin, hebû. Berî destpêkirina fîlm kokteylek ji layê nivîskar ve hate dayîn. Di vê kokteylê de gelek nivîskarên tirk, derhêner û hwd. jî cihê xwe girtibûn. Di nav wan de hin kesên navdar wekî Orhan Pamuk, Lale Mansur jî dihatin dîtin. Piştî kokteylê nivîskar Antonio Tabucchi, rexnegir Rekin Teksoy li ser edebiyat û sinemayê gotûbêjek li dar xistin. Piştî vê gotûbêjê fîlmê bi navê 'Pereira îdia dike' (Sostiene Pereira) dest pê kir. Fîlm dema şerê navxweyî yê Îspanyayê tîne ber çavan. Di fîlm de qala têkoşîna Tugayên Sor ên Navneteweyî li dijî dîktatoriya Franko tê kirin. Fîlm serpêhatiya mirovekî ji rêzê Dr. Pereira tîne zimên. Ew piştî ku hovîtiya hêzên dewletê dibîne, bi ser xwe ve tê û piştgiriya Tugayên Sor dike.

Bi rastî fîlm bi awayekî hostayî hatiye kişandin. Ev fîlm wê di rojên pêş de li sînemayan jî bê nîşandayîn.

AZAD ALTUN

## TÎŞK

LERZAN JANDÎL



## Raştnivisnayene

Sebeta ke dîroka ma de aşma newîne aşmêde muhîm a, ez wazena verde naye ser ro kilm vinderî û bado jî nivisa xo binivisnî. Dîroka ma de cayê aşme newîne zê cayê xelê aşman zaf giran o. Zê 1916 de sarewerdayena Koçan, 1929 da sarewerdardayena Tendûrekî, 1930 de sarewerdardayena Araratî, 1938 de guretena Sey Rizay û destcikerdena qatlîamê Dêrsimî pêro na aşme de biye. Wunciya 24'ê na aşme, dîroka gurtiyanê ma de, dîroka şar û tekoşîna ma de rojêde rojanê balkeşan ra we. Na rojê zê rojanê bînanê balkaşan Guretgehê Amedî de guretiyê cengî, şerwanê ma ebi armanc û derba kiştene amê kuyayenê û nînan ra jî 10 guretiyê azadiyê amê kiştene, hunde jî giran bi bîrindar (dirvetin). Raya azadiyê û serfiraziye de şahedetê nê şehîdan û şehîdanê bînan pêrîne ver de ebi hurmet benîme çewt. Şima û 24.09.1996 xo vîra nêkenîme.

***

Se ke wendoxê ma jî zanenê, raştnivisnayena zonê (ziwanê) ma wertê ma de problemêde girs a. Problemê raştnivisnayene hem hetê alfabe de û hem jî hetê îmla de, yanê qural û qeydanê nivisî nivisnayene de, estê. Ma zanîme, ke derheqê alfabe de di tendensê (meylê) girsî û ebi sedan jî meylê qijî estê. La belê sebeta ke her kes angorê xo nivisneno û na ware de standantî çînê, derheqê îmla de ebi hazaran meylî estê. Nê jî hem wendena, hem nivisnayena zonî, muhîmêrî jî musayen û musnayena zonî kenî zahmet û giran. Wayîrê her meylî jî angorê xo raşt û hem jî tûj o. Tey qe qesekerdene nêbena. Ebi nê qeydeyî jî mordem nê meylan miyan de beno şaş û gêj.

Zaf kesî vanê: "Raşt a, na derheq de kêmasî û şaşî estê, çimke dewleta ma, înstîtûtê ma, ûnîversîteyê (zankeyê) ma çîne. Eke ma bibîme wayîrê nê çiyan, nê problemî jî werte ra darînê we."

Ez nayê zaf realîst nêvînena. Ma ebi naye çareserkerdena problemanê zonê xo avê ton danîme, la belê çareser nêkenîme. Ez na derheq de wazena reformê raştnivisnayena ziwanê almankî ser ro vinderî û sebetake wendox xo rê yew fikir bivirazo, tenê înformasyona bidêrî. Se ke êno zanayene zonê almanan ebi almankî nivisnayena Încîlî ver bi jûtiye şono û na jûtiyê ebi Bismarck bena pêt û bado jî jûtiya zonî hetê nivisnayen û medya de, karê dewlet û mekteban de êna ca. Ha derheqê gramerî de, ha derheqê dîroka zonî de, ha derheqê etomolojiyê çekûyanê zonî de, ebi kilmiye her hetê zonî de ebi hazaran pirtûkî amê nivisnayene û ebi hazaran karê îlmî amê kerdene. Zonzanayî (ziwanzanî) nê zanî ser ro hênî xebetiyê ke ra û rêçê zonî, qural û qeydeyê zonî zaf zelal nê ro. Hatanî quralê bêquraltiyê jî nê ro (vetê). Mordemî hênî bawar kerdêne ke no zon her het ra amo ronîştene.

La belê nê, no zon yanê almankî huna jî niyamo ronîştene, ke seba naye jî yew reform amê viraştene.

No reform ebi xebat û hetkariya înstîtûsyonanê dewlete yê pêrîne amê amadekerdene. Ûnîversîteyan ra bicêrîme, hetanî sendîkayan, mamostayan (musnekaran) ra bicêrîme hetanî kardaran (karsaz) welatanê federalan ra hetanî kesîtiyan, her kes na derheq de xebetiya, bawariya xo vatê, hetê hazirkerdena reformî kerd û pêyniye de jî dewlete qerar da ci reform qaxite ser ro amê viraştene.

Qaxite ser ave viraştene, çimke zaf kesan no raform qebûl nêkerd. Ma û piyanê şagirtan dadgehan (mahkeman) hemverê nê reformî dawayî kerdî ra. Vat ke: "Yew: ma nê reformî raşt nêvînenîme. Dide: Domanê ma hatanî nika ebi yew metod zanê xo musê, hatanî ewro amê, ewroyî ra tepiya reform performansê domananê ma dano waro û sarê domananê ma keno temiyan. Ma/Ez zê ma û /yan jî piyê domanî nê reformî nêwazena."

Peyniye se biye wendoxê delalî, şima zanenê? Peyniyê xêlê dadgehanê welatanê federalan qerar seba ma û piyan da. Sebeb û bingeyê qerarî jî niya da:"Ebi nê reformî êrîş êno mafê kesîtiya (kişilik hakları) domanan, yanê şagirtan ser. Yanê mafê kesîtiya domanan erzîna binê lingan. Seba naye jî ganî nê zonî zê verî, yanî hatanî nika se ke muso, ganî hênî bimuso, hênî biwano û binivisno."

Dewleta Almanî jî angorê qeraran reformo ke qaxite ser ro viraşt bî, nêşîkîna ke mekteban de biyaro ca. Na mesela de bêçare menda. De nika ma bêrîme ma, dora ma wa. Ma de kulturêde niyanên, toleransêde niyanên, zanayenêde niyanênê esta?

Eke meyşte (siva) bîro dewletêde ma bibo û qerarê reforman bidero ci, mahkemeyê ma şîkînê hemverê qerarê dewlete qeraran biderê ci, yan jî ma û piyî şîkînê hemverê qeraran dawa ra kerê? Ez cewabê nînan û persanê bînanê ke na mesala ra girêdayîyê nêşîkîna ebi hêya biderê.

Seba naye jî ganî ma ewro ra dest bi çareserkerdena nê probleman bikerîme, ke ma meyş de bişîkîmê nînan çareser bikerîme. Ebi na hêviya ez venga her kurdiyo ke na derheq de sarê xo dajneno, dana ke destê xo rew bicêro û hetkariya çareserdene bikero.

www.arsivakurdi.org

# Çend mînak ji dûrikên dawetan ên BOTAN (1)

Di govendên Botan de amûrên muzîkê kêm in. Jixwe ne hewce ye. Di dawetên Botan de, çend kesên ku serê dîlanê dikişînin dest pê dikin û govendê geş dikin. Di geşkirina dîlanê de ew kesên serkêşiyê dikin, dûrikan jî dibêjin. Li dû wan de jî, mirovên govendê mîna "koro" yê bi hev re li wan vedigerînin

Ji govendên Botan navê çend lîstikên girîng: Hilatvetîn, Tilîk, Navincî, Tilîka navincî, Sêgavê û Bablekan...

Di van govendan de bi gelemperî dûrik li ser evîn û eşqa keç û xortan e. Dîsa, li ser şer ê eşîrtî û mêrxasiyê, li ser egîdan, têkiliya mirovahiyê û nêzîkbûna xwezayê her dem di dûrikan de derdikeve pêş.

Her dûrik li gora meqamekî govendê hatiye çêkirin û tê gotin. Bi vî awayî jî, Folklora Botan bi giraniya xwe, bandora xwe li ser çanda dewlemend a kurd daye nîşan.

Di dûrik û stranên folklora Botan de tê xuyakirin ku, tu tesîra ol û îslamê zêde li heremê ne xurt e. Lewre di dûrikan de tê dîtin ku bi dilpaqijî têkiliya keç û xortan tê eşkerekirin. Ew di wexta çûna beriyê de, di rojên cejnan de bi dilgermî evîna xwe eşkere dikin. Dûrikan davêjin ser hev û distirên. Di govend û dîlanan de keç û xort, jin û mêr dest û milên xwe didin hev û direqisin. Çawa ku bandora ola li heremê zêde nehatiye dîtin; bandora gelên biyan jî nehatiye dîtin.



### HEY KÛRE

*Hey kûr e kûr e*
*Gêra Mûradê kûr e*
*Wê tê de masiyê hûr e*
*Bûka me bêqusûr e*
*Gêra Mûradê kûr e*
*Hey teng e, teng e, teng e*
*Gêra Mûradê teng e*
*Wê tê de masiyê reng e.*
*Gêra Mûradê teng e*
*Bûka me bi nav û deng e*
*Gêra Mûradê teng e*
*Hey tijî tijî tijî*
*Gêra Mûradê tijî*
*Wê tê de masiyê bejî*
*Gêra Mûradê tijî*
*Bûkaniya min û te jî*
*Gêra mûradê tijî*
*Wek Zapê tijî*
*Gernas ên bi dengîn.*

### LO MÎRO

*Lo mîro tê Têlanê*
*Lo bego tê ji Têlanê*
*Lo mîro şûr girêda*
*Danî li ser kolanê*
*Lo mîro şûr girêda ser kolanê*
*Heyfa lawê Xerzan*
*Mane li ber baranê*
*Heyfa xortê Xerzan*
*Mane li ber baranê*
*Lo mîro tê ji Zewqê yo*
*Lo mîro şûr girêda*
*Danî li ser newqê yo*
*Lo bego şûr girêda*
*Danî li ser newqê da*
*Heyfa lawê Xerzan*
*Manê li ber berfê yo*
*Heyfa xortê Xerzan*
*Mane li ber berfê yo*
*Lo mîro tê ji Dihokê*
*Lo bego tê ji Dihokê*
*Lo mîro şûr girêda*
*Danî li ser kefşokê*
*Heyfa lawê Xerzan*
*Mane li ber teyrokê.*

### NALBENDO

*Nalbendo nala çêke*
*Solbendo sola çêke*
*Hûr hûr bizmara lêke*
*Êvarê min vê rêke*
*Par keç bû îsal bûk e*
*Nalbendo nal mezino*
*Solbendo sol mezino*
*Serê nalê bazino*
*Binê nalê bazino*
*Par keç bû, îsal jin o*
*Nalbendo nal radayo*
*Solbendo sol radayo*
*Serê nalê badayo*
*Binê nalê badayo*
*Par keç bû îsal dawo.*

### CIZÎR

*Cizîrê Cizîrê malê min, malê min*
*Cizîrê Cizîrê sal buhurî ji emrê min*
*Cih meskenê mîrê mala min, mala min*
*Cih meskenê mîrê, sal bihurî ji emrê min*
*Me Cizîr ava kir mala min, mala min*
*Me Cizîr ava kir, sal bihurî ji emrê min*
*Kursiya zêr şerab kir, mala min mala min*
*Kursiya zêr şerab kir, sal bihurî ji emrê min*
*Yezdan Şêr ser suwar kir, mala mi mala min*
*Yezdan Şêr ser suwar kir, sal bihurî ji emrê min*
*Cizîr dar û bî ye mala min, mala min*
*Cizîr dar û bî ye, sal buhurî ji emrê min.*
*Kursiya zêrê spî ye, mala min, mala min*
*Kursiya zêrê spî ye, sal buhurî ji emrê min*
*Yezdan Şêr ser daniye, mala min, mala min*
*Yezdan Şêr ser daniye, sal buhurî ji emrê min*
*Cizîr dar û ber e, mala min, mala min*
*Cizîr dar û ber e, sal bihurî ji emrê min*
*Kursiya zêrê zer e, mala min, mala min*
*Kursiya zêrê zer e, sal bihurî ji emrê min*
*Yezdan Şêr danîn ser, mala min, mala min*
*Yezdan Şêr danîn ser, sal bihurî ji emrê min*
*Cizîra Botan e, mala min, mala min*
*Cizîra Botan e, sal buhurî ji emrê min*
*Firfira cotan e, mala min, mala min*
*Firfira cotan e, sal buhurî ji emrê min*
*Meskenê şêran e, mala min, mala min*
*Meskenê şêran e, sal buhurî ji emrê min.*

BERHEVAKAR:
HEMED ETA SALMAN

# Berhemeke hêja, ji bo azadiya Leyla Zana

*"Dema hikûmetek hindikahiyekê diçewsîne, mafên hemû welatiyan (ne têne mafên wê hindikahiyê) têne tehdîtkirin. Ji bo xatirê demokrasiya Li Tirkiyeyê divê Leyla Zana bê berdan."*

Ev gotinên li jor ên Elie Wieseyê ne û di berga, pêşîn a pirtûka bi navê "Free Leyla Zana! (Ji Leyla Zana re Azadî)" de cih digirin.

Ev pirtûk ji layê Tora Agahiyan a Kurdên Amerîkî (AKIN) ve hatiye amadekirin. Pirtûk, ji giyana hemû kurdan re hatiye diyarkirin ku bi navgînên demokratîk di riya pêkanîna xewna kurdan: azadkirina Kurdistanê de meşiyane û di vê rê de hatin kuştin re hatiye diyarkirin. Her wiha jî ew ji hemû girtiyên kurd û Rojhilata Navîn re hatiye diyarkirin. Pirtûk bi pêşeke Dr. Jose Ramos–Horta dest pê dike. Nûnerê tevgera azadîxwaz a Tîmora Rojhilat û xwediyê xelata Nobela 1996'an, Dr. Jose Ramos Horta, pêşî dide zanîn ku gelên bindest ji bo doza neteweyî li dijî zordestan serî hildana, ji wan gelan yek gelê Tîmora Rojhilatê, yek jî gelê kurd e. Horta diyar dike ku dema dewletên mezin çavên xwe ji neheqiyên li ser gelên bindest re digirin, rê li ber hestên çewsîner vedikin, da ku ew hest û ramanên mafnenas li seranserî cîhanê belav bibin. Di pirtûk de sê pêşek cih digirin, pêşeka ji hêla Kathryn Cameron Porter ve, pêşeka sêyemîn jî bi destê Lord Eric Avebury hatiye nivîsîn. Dîsa gelek kesên navdar li ser kurdan û doza Leyla Zana bîr û rayên xwe anîne zimên, berdana mebûsên kurd xwestine.

Her wiha axaftinên ku ji bo serbestiya Leyla Zana li Kongreya Amerîkayê ji hêla nûneran ve hatine kirin, nûçeyên ku li ser Leyla Zana di weşanên cur bi cur de hatine weşandin jî di nava rûpelên navborî de cih digirin.

Dîsa nameyeke ku 85 endamên Kongreya Amerîkayê îmze kirine û ji Serokê Amerîkayê Bill Clinton re şandine da ku ew ji bo serbestiya Leyla Zana pî bide ser dewleta tirk jî, di pirtûkê de hatiye weşandin.




Li aliyê din axaftina ku Leyla Zana û Ahmet Türk di 17'ê gulana 1993'yan de li pêşberî Komîsyona Helsînkî di Kongreya Amerîkayê de kiribûn, hinek mesajên daye Zana jî di nava pirtûkên de hene.


Bi taybetî derdorên amerîkî ku piştevaniya kampanyaya azadiya Leyla Zana dikin, balê dikişînin vê rastiyê ku sedemeke cezaxwarina wê, axaftina ku Zana li Kongreya Amerîkayê kiriye.

Di nava pirtûkê de beşên herî balkêş, îdianameya dozgerê DGM'ê û parêznameya Leyla Zana ye. Dema mirov îdianameyê dixwîne, tê dîtin ku îdianame, bersiva gelek îdiayan di nava xwe de dihewîne. Di rêzeke de tê gotin ku "sûcdar doza mafê kurdan dike", piştî van rêzan îcar tê gotin ku "ew dewletê bi înkarkirina kurdan sûcdar dike."

Ev pirtûk wekî parçeyekî çalakiyên kampanyaya ji bo serbestiya mebûsên kurd hatiye weşandin.

SAMÎ BERBANG

# Ahmedê Xanî




Li ser jiyan, berhem, bîr û baweriyên Ehmedê Xanî, dîsa bi navê "Ehmedê Xanî" pirtûkeke di nav wêjeya kurdî de cihê xwe girt. Ev pirtûka ku ji layê Mûrad Ciwan ve hatiye nivîsandin, ji hêla weşanxaneya 'Doz' ve hatiye çapkirin. Ev pirtûka navborî, ji 336 rûpelan pêk tê û berhema nivîskar a duyemîn e. Berî vê pirtûkê jî, pirtûkeke Murad Ciwan bi navê "Rêzimana Kurdî bi şîrovekirina bi Tirkî– Lehçeya Kurmancî", li Swêdê di sala 1992'yan de ji layê weşanên Jîna Nû ve hatibû çapkirin.

Bêguman gava qala Ehmedê Xanî tê kirin, şaheser a wî ku Mîr Celadet Alî Bedirxan mîna "Kitêba miletême" bi nav kiriye, destana "Mem û Zîn" tê bîra mirov. Ger ku mirov li ser Ehmedê Xanî tiştek bibêje an binivîse, divê çavkaniya yekemîn destana Mem û Zînê be. Nivîskar jî, di fêmkirina der barê jiyan, bîr û baweriyên Ehmedê Xanî de, şahesera Mem û Zîn ji xwe re mîna çavkaniya sereke hilbijartiye. Lê belê ji bilî vê jî, ji berhemên Xanî yên din; Nûbara Biçûkan, Eqîda Îmanê, Eqîda îslamê, Şiîr û Xazelên wî û ji gelek berhemên ku heta niha li ser Ehmedê Xanî hatine nivîsandin, sûd wergirtiye. Pirtûk bi giştî, ji şeş beşan pêk hatiye. Di beşa yekemîn de qala xebatên ku heta niha li ser Ehmedê Xanî hatine kirin (çi pirtûk, kovar, maqale û hwd.) tê rawestîn û carinan jî bi kurtebirî li ser naveroka wan agahî hatine dayîn. Di vê beşê de di nav kesên ku xebat û lêkolîn li ser E. Xanî kirine de pirbûna yên biyanî bala mirov dikşîne.

Di beşa duyemîn a pirtûkê de, li ser dewra Xanî hatiye sekinîn û der barê rewşa Kurdistan û Cîhanê de agahî hatine dayîn. Dîsa bîr û baweriyên Ehmedê Xanî yên li ser kurdan û daxwazên wî yên li ser avabûna dewleteke kurd jî di vê beşê de ye. Di beşa sêyemîn de, bi nasandina berhemên Xanî re, li ser jiyana wî hatiye rawestandin. Di beşa çaremîn de, li ser bîr û baweriyên Ehmedê Xanî yên felsefî, tasawufî, pirsên dînî û manewî, pirsên îdarekirina dewletê, evîna madî û manevî û li ser piralîtiya wî hatiye rawestîn. Ramanên wî yên li ser têkiliya zayendî û erotîzmê gelekî balkêş e. Beşa pencemîn a pirtûkê, li ser şiîr û xazelên wî û niqaşên derbarê rastbûn û nerastbûna destana Mem û Zînê de ye. Di beşa dawî ya pirtûkê de, ferhengok cih digire, nivîskar di vê beşê de peyvên biyanî (erebî, farisî, tirkî) ji bo xwendevanan rave dike. Ev berhem, ji bo kesên ku dixwazin li ser Ehmedê Xanî agahdar bibin, çavkaniyeke hêja ye.

SERWÎSA ÇANDÊ

# Ne bi vê bazarê, ne bi vê dawetê

FAYSAL DAĞLI



Frantz Fanon psîkologekî çermreş e. Bi salan di nava welatên Afrîkayê ên koloniyên ewrûpiyan de xebitî. Piştî salan û çavdêriyên direj gihîşt encamekê. Mirovên ji deverên kolonî, xwe li hemberî kolonyalîstan kêm dibînin. Ev xwe kêm dîtinan jî kompleks di hemû kategoriyên civakên kolonî de heye, ew nikarin xwe bi hêsanî ji vî bayê nexweşiyê dûr bigirin. Fanonê doktor derman jî dibêje helbet: Şoreş. Lê pêşî di mêjiyan de.

Kurd jî gelekî bindest e. Wekî hemû kolonyalîstan dijminê kurdan jî bi mêjiyê wan lîstiye. Baweriya wan bi hev şikandiye, rêz û hezkirina wan ji hev re nehiştiye. Wan bi xwe ve girêdaye. Rewîngiya kurdan a ber bi çala dîrokê ve, ji aliyê canfidayê şoreşger ve bi teqîna gelawêjê hate rawestandin. Tivingê, şerefa kurdan li wan vegerand. Azayên laşê neteweya kurdê nexweş hêdî hêdî hatin ser xwe.

Kurd bi şoreşê re gelek bi pêş ketin. Bi bedelên mezin xelatên mezin girtin. Bi qurbanên pîroz hîmê pêşerojeke serbilind danîn. Şehîdan, birîndaran, wendahiyan, sirgûniyan, girtiyan, sewiyan, birçiyan... Kurteçîroka jiyana kurdan ev bû. Piştî vê serpêhatiya lanetkirî berhemên xwe civandin.

Yek ji van berheman rojname bûn. Bi saya van rojnameyan êdî li ser rûyê cîhanê dengê wan jî bilind dibû. Musa Anterê sernûserê rojnamevaniya Kurdistanî û nêzî 25 hevalên wî xwîna xwe kirin hubra vê rojnamevaniya neteweya bindest ango welatê kolonî. Piştî şehadeta wî, ji bo bîranîna şehîdên rojnamevaniya vî gelê bindest birqeyên bixelat hatin lidarxistin. Ji sala 1993'yan vir de ji bo bîranîn û pêşxistina vê şûnewara qehramanî ev xelat bi merasîman digihêje xwediyên xwe. Îsal jî rojnameya Ülkede Gündem ev barê pîroz, barê xelatdayînê girt ser xwe û çendekê berê, birqeyê bi encam kir.

Lê 25 caran mixabin, di jûriya nûçeyan de yek rojnamevanekî kurd jî tunebû. Her wiha di jûriyên din de jî yek an du kesên kurd hebûn. Piştî ku min ev lîsteya jûriyê dît, ez fikirîm; Fanon ji serî heta binî mafdar e: Divê pêşî mêjî bê guhartin.

Bawer dikim heke Musa Anter ev rewş bidîta wê wisa bigota:

Ne bi vê bazarê û ne jî bi vê dawetê!

# Melîk zêrekî tenê nade

Rojekê melîkê Misirê xwe dixe şiklê gundiyan û dikeve nava bajarê xwe û digere. Armanca wî ew e ku, rewşa gelê xwe bibîne. Wê demê rastî lawikekî tê. Di bin çengê lêwik de pirtûkekê dibîne. Gazî lêwik dike û navê wî dipirse.

– Navê te çi ye?

Lawik: Navê min Seyfetullah

– Navê bavê te çi ye?

– Navê bavê min Habîbûllah

– Ew çi ye di bin çengê te de?

– Kelamullah

– Baş e, ma dersa te çi ye lawikê delal?

– Dersa min qêsemûellah

Dema ku van bersivên xweşik ji lawik digire, pir kêfa wî jê re tê. Ji bêrîka xwe zêrekî derdixe dirêjî lêwik dike, lê belê lawik nagire.

Melîk:

– Çima tu nagirî?

– Ez zêr bibim malê wê dê û bavê min, li min bidin. Wê bibêjin te zêr dizî ye.

Melîk:


– Kurê min tu bibêje; 'Melîk daye min', ew li te nadin.

Lawik:

– Naxêr; ew ji min bawer nakin; wê bibêjin 'Melîk zêrekî tenê nade mirovan.' Wexta Melîk bide, (kumê xwe ji serê xwe derdixe û li ber Melîk digire) ev qasî dide.

Melîk dimîne heyirî. Lê belê hêj zêde ji lêwik hez dike û dibe xezîna xwe, kumê lêwik tijî zêr dike. Lawik zêrê xwe digire, tê mala xwe. Dayik û bavê lawik jê dipirsin; lawik jî meselê ji serî heta binî ji wan re dibêje. Ew jî bawer dikin û pir kêfxweş dibin.

Lê belê lawik ji dayik û bavê xwe re dibêje ji van zêran hebekî xerc nekin. Lewre ku qezenca bê ked her tim ji mirovan re astengiyê derdixe. Ka em piçek sebir bikin, bila qederekê bisekine ku ziyanek jê nehat, hîna em xerc bikin.



Melîk, bi xwe ji xwe re difikire û dibêje: "Ev zarok ev qas bi aqil û bi feraset bû, gelo bavê wî çiqas zana ye. Rojekê gazî bavê lêwik dike û tîne huzûra xwe ji wî çend pirsan dike. Der heqê kurê wî de çi pirsê jê dike, bavê lêwik bersiva wî dide. Lê belê der heqê îslamiyetê de çi pirsê jê dike, tu bersiveke rast ji wî nagire. Ji ber wê yekê Melîk ferman dide, dibêje ev mirovê hanê kafir e. Wî bibin bixeniqînin. Celad wî digirin dibin ku bixeniqînin; di wê demê de lawik dibihîze ku wê bavê wî bixeniqînin, ew jî direve diçe malê kumê zêra digire û dibe li ber Melîk datîne û dibeje;

– Milûkê min, te zêr dane min û ji berdêla zêran jî tu bavê min ji min distînî. Kerem bike zêrên xwe bigire û bavê min bide min.

Melîk:

– Kurê min, ez ji bo zêran bavê te nakujim, min der heqê îslamiyetê de çi pirs jê kir, wî bersiv neda. Şertê îslamê nizanibû. Ji ber ku bavê te kafir bû min fermana mirina wî derxist.


Lawik:

– Milûkê min, nezanîna bavê min ne sûcê bavê min; sûcê kalê min e. Bavê min min da xwendin. Lê belê bavê wî ew nedaye xwendin. Here kalê min bixeniqîne. Lewre sûc, ê kalê min e.

Milûk wê demê qederekê difikire, gotina lawik rast dibîne û bavê lawik azad dike.

MÜCAHİT SEVER

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (87) XAÇEPIRSA



### Berşiva Xaçepirsa 85'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 87'an, kaseta Xelîl Xemgîn "NAMÊ" ye

***Jêrenot:***

*Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.*




Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 85'an kaseta Ozan Xanemîr "Welatê Rojê" qezenç kirine: Tuncay Demirci/Mêrdîn, Sadun Temel/Manisa, Mervan Azad/Batman, Murat Yapıştıran/Mêrdîn, Serhat Baran/Qeyserî

Xaçepirsa bi xelat (87) – pênase:

İmdat / Rewşenbîrek (Wêne) – Teze / Rezîl û riswa bû – Sembola zîv / Dem – Sebir / Cînavkek – Kûçik / Rêzgirtin – Tazî – Wiha / Bi soranî çav – Lawirek / Qertafek – Tîpeke kurdî / Xwarineke bi bêhn – Nexweşî yek / Çi kes in? – Berhe meke şir / Oksîjen – Kîn û gir / Karbon – Kesê har / Qelend – Noteyek / Jin – Oksîjen – Dihîne / Têbînî – Navekî mêran / Bi dimilkî hundir – Tune / Avê dîvê – Devokî 'jî' / Toq – Stêrk / Lê genim tê hêrandin – Kêfxweş / ...rês – Edet / Tîpeke kurdî – Bira



PEYVA VEŞARÎ: 1 2 3 4 5 6 7 8




# Artêşa tirk çû hawara PDK'ê


**Di wê demê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan dabû zanîn ku PDK nikare demeke dirêj xwe li ber êrîşên gerîla rabire û wê li serê Artêşa Tirk bibe bela. Niha tê dîtin ku ev nirxandin, rast derdikeve.**

Artêşa tirk piştî ku di 14 gulanê de bi sedhezar leşkerî başûrê Kurdistanê dagir kir, lê li hemberî berxwedan û êrîşa gerîlayan xwe ranegirt û vekişî, îcar bi 30 hezar leşkerî û tank û topan çû hawara PDK'ê.

Di wê demê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan dabû zanîn ku PDK nikare demeke dirêj xwe li ber êrîşên gerîla rabire û wê li serê Artêşa Tirk bibe bela. Niha tê dîtin ku ev nirxandin, rast derdikeve.

Li gorî nirxandina çavkaniyên xwecihî, her çiqas çapemeniya tirk vê bûyerê binepixîne û wekî bûyereke nû nîşan bide jî, jixwe bi 12 hezar leşkerên dewleta tirk qet ji herêmê veneqişîne û her tim li herêmê mane. Niha ew hêzên, leşker û techîzatên nû tên taqwiyekirin.

Çapemeniya tirk a ku daxuyaniyên generalan dike nûçe, rastiyên ku cîhan dizane berevajî dike û îdia dike ku "PKK'ê di tevgera berê de derbeyên mezin xwarine. Lê ji nû ve hêzên xwe dide hev û li ser sînor bi cih dike." Di vê navê de ew rastiyeke din jî didin der, PDK li hemberî gerîla têk çûye. Li gorî agahiyên ku çapemeniya tirk didin, PDK agahî girtiye ku wê gerîla êrîşî Zaxoyê bikin, ji ber vê yekê leşkerên tirk vexwendine. Lê rastiyeke din heye; jixwe tê zanîn ku hêzên dewleta tirk ji berê ve li Zaxoyê hene, wan ji bo parastina xwe hêzên xwe ji êrîşa gerîla, hêzên nû kişandine herêmê, li ser banga PDK'ê.



Dewleta tirk li aliyekî, PDK'ê wekî çekekê bi kar tîne, li aliyê din jî hinek tevdîrên kirêt digire. Tê gotin ku niha hinek leşkerên tirk bi kinc û nasnameyên tirkmenan li nav bajaran digerin, dixwazin bi vî awayî destikên xwe tirkmenan derxin pêş. Dîsa tê ragihandin ku dewleta tirk dixwaze li bajaran hejmara tirkmenan ji kurdan zêdetir bide xuyakirin, lewre jî bi pereyan kurdan dike tirkmen, ango kesên kû nasnameya tirkmenan dipejirînin, ji dewletê 50 dolarî distînin.

Digel hemû hewldanan jî, rê li ber êrîşên gerîla nayê girtin. Tê daxuyandin ku roja 24'ê rezberê hêzên ARGK'ê navçeya Deralûkê dane ber guleyên topên hawanê, 13 guleyên topan li tankên dewleta tirk û çeperên PDK'ê ketine. Li ser xesara ku gihîştiye PDK û hêzên tirk tu agahiyên sayî bi dest neketine.

NAVENDA NÛÇEYAN

### SERXWEŞÎ

Bavê nûnerê rojnameya me yê Amedê Îhsan Uğur, HAYRETTİN UĞUR ji ber nexweşiyeke giran, li Nexweşxaneya Balcalı ya Edeneyê çû ser dilovaniya xwe. Em ji hevalê xwe û malbata wî re serxweşiyê dixwazin.

**Xebatkarên Rojnameya Azadiya Welat**

## Ferhengok

**arîn:** veşewitîn, qerisîn
**arîşe:** kêşe, pirsgirêk, asteng
**berevajî:** parastin, berhingarî
**bikêş:** bi wezn
**bujenî:** darengî, madî
**çewsîner:** zordar (baskıcı)
**çu:** tu, hîç
**danêr:** îcatkar
**dilziz:** dilkovan, xemgîn
**dirav:** pere
**doman:** pêvajo, proses
**dûgel:** dewlet
**gerdûn:** alem, evren
**gernas:** leheng, nebez, qehreman
**giramî:** rêzgirtin, hurmet
**hubr:** murekeb
**hincet:** ûşt, bahane
**hemdemî:** nûjen, modern
**hest:** dilîn, hîs
**jindewar:** jindar
**jivan:** randevû
**karbidest:** rayedar, berpirsiyar
**kariger:** bikêr, sudewar
**kurteçîrok:** hikaye
**lêvegerandin:** bersivdan
**movik:** bişkoj
**noker:** xulam
**parêzname:** îdianame
**pêkan:** reng, gengaz, mimkûn
**pêlawaz:** wezn
**pêşbazî:** berebazî, milmilane
**pêşek:** önsöz
**qelandin:** qirkirin, sorkirin
**qerfok:** henekbaz, galteker
**ray:** raman, hizr
**semûser:** semiviskar
**seza:** ceza
**şayes:** taswîr
**têbînî:** nîşe, not
**têkûz:** bêkêmasî, komple
**tore:** wêje, edebiyat
**xeternak:** bi talûke
**zexm:** qewîn, saxlem


**WELAT**

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

**Li ser navê Zerya Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. (adına)**
**Xwedî (Sahibi)**
CELALETTİN YÖYLER

**NAVNÎŞAN**
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
**TEL–FAX**
(0 212)
251 90 13

**Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni)**
SAMÎ TAN

**Berpirsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü)**
M. SALİH TAŞKESEN

**Berpirsê Saziyê (Müessese Müdürü)**
TAHİR ELDEMİR

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**BELAVKIRIN**
BİRYAY Dağıtım

**NÛNERÎTIYÊN ME (Temsilciliklerimiz)**
**Munchen:**
(Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 84
**Brûksel:**
Medenî Ferho
32 532 721 12 03
**Suriye:**
Jana Seyda
Helîm Yûsiv
**Berlin:**
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495
**Hannover:**
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60
**Stockholm:**
Robîn Rewşen
46 87 51 05 64
**Bonn:**
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49
**Hollanda:**
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

# Apê Mûsa hate bi bîranîn

**Çalakiyê, ji bo tevahiya şehîdên şoreşa Kurdistanê, bi deqîqeyek rawestîna rêzgirtinê dest pê kir. Piştî re, ji dema jidayikbûnê ta şehadeta wî, jiyana Apê Mûsa, tevî helbesta wî ya navdar "Kımıl" ji hêla pêşkêşvanê çalakiyê Kawa Nemir ve hate xwendin.**


### Ramûsana Apê Mûsa

*..."Ji bo ku em hevdîtinekê pêk bînin, ez û hevala xwe ya rojnamevan rojekê çûn mala Apê Mûsa. Piştî ku em rûniştin Apê Mûsa hate cem me, ji min re got: Ez dikarim vê jinikê maçî bikim? Ez şaş û metel mam, min got: Belê apo, maçî kir, rabû çû mitbexê, piştî demekê kurt hat dîsa got: Ez dikarim careke din vê jinikê maçî bikim?, min dîsa got: Erê!, careke din got, min dîsa erê kir... Çend meh borîn, rojekê ez û pîreka xwe em çûne mala wî, min cara yekemîn jina xwe bi Apê Musa dida naskirin. Şaş ma û ji min re got: Qey ew pîreka ku te cara ewil anîbû vê derê ne jina te bû?, min got: Na apo!, rabû ser xwe û ji min re wiha got: Malnexerab...! te çima wê gavê negot, ji bo ku min bêhtir ew maçî bikira."*

Nivîskar û lêkolîner Îsmaîl Göldaş, roja 20'ê rezberê di çalakiya bîranîna 5'emîn salvegera şehîdbûna Mûsa Anter de, li NÇM' ya Stenbolê, bi van gotinên li jorê qerfokiya Apê Musa anî zimên.

Çalakiyê, ji bo tevahiya şehîdên şoreşa Kurdistanê, bi deqîqeyek rawestîna rêzgirtinê dest pê kir. Piştî re, ji dema jidayikbûnê ta şehadeta wî, jiyana Apê Mûsa, tevî helbesta wî ya navdar "Kımıl" ji hêla pêşkêşvanê çalakiyê Kawa Nemir ve hate xwendin. Bi rêzê navên wekî pîreka Apê Mûsa Hale Anter, Feqî Huseyn Sağnıç, kurê Apê Mûsa Dicle Anter, lêkolîner İsmaîl Göldaş û pîreka Serokê Parlamentoya Kurdîstanê li Derveyî Welat PKDW'ê Yaşar Kaya Yurda Kaya ji bo ku dîtin, raman û bîranînên xwe yên der barê Apê Mûsa de bînin ziman ji ser sahnê hatin vexwendin. Hale Anter ji ber psikolojiya rojê, zêde nikaribû biaxive, lewre jî wê bi tenê silavên xwe pêşkêşî beşdaran kirin. Feqî Huseyn Sağnıç di axaftina xwe de da zanîn ku her çiqas ew hewl bidine xwe jî ewê nikaribin behsa tevahiya jiyana Mûsa Anter bikin, ji ber ku jiyana wî têrtijî û dewlemend e. Feqî Huseyn Sağnıç di dûmahîka axaftina xwe de wiha got: "Di cemaetan de, di civînên siyasî û civînên bi gundiyan re de û di her celeb civatan de para herî zehf ji gotinan, ya wî bû."

Piştî Feqî Huseyn, nivîskar û lêkolîner İsmaîl Göldaş bîranîna ligel Apê Mûsa ku me pê dest bi nivîsê kiribû vegot. Ji ber vê bîranînê gelek beşdar ji kenan pişto-ziko bûn.



Kurê Apê Mûsa, Dîcle Anter di axaftina xwe de da zanîn ku, wî tu caran Mûsa Anter bi tenê wekî bav nedîtiye. Lewre Apê Mûsa ji bo wî mîna heval û hogirekî bûye.

Jina Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya, Yurda Kaya di çalakiyê de axaftina herî hestiyarî kir û da zanîn ku Mûsa Anter ji bo wê mîna bav bûye.

Piştre pêşandana slaytê dest pê kir. Di slaytê de tevî wêneyên Apê Mûsa; ji Cengiz Altun, bigire heta Ferhat Tepe wêneyên hemû şehîdên çapemeniya kurd, serhildan, hovîtiya tîmên taybet û xwezahiya Kurdistanê bi riya sînevîzyonê hate pêşkêşkirin.

Piştî pêşandana slaytê, ji NÇM'a İzmîrê "Teatra Hêvî" çend helbest bi şêweyekî operayî pêşkêş kirin.

Çalakiya li NÇM'ê bi kurtelîstika Teatra Jiyana Nû ya bi navê "Zarokên Apê Mûsa" qediya. Lîstikvanên şanoyê di vê kurtelîstikê de, jiyana belavkarên zarok ên ku rojnameya Özgür Gündemê li Amedê belav dikin, radixin ber çavan. Lîstika ku tê de şehîdkirina Apê Mûsa jî dihat nîşandayîn, bû sedema dilzîziya gelek beşdaran.

### Apê Mûsa li HADEP'a Bahçelievlerê bû

Çalakiyeke ji bo bîranîna Apê Mûsa jî roja 21'ê rezberê li HADEP'a Bahçelievlerê pêk hat. Piştî rawestîna rêzgirtinê ji bo şehîdên Kurdistanê û Apê Mûsa, Serokê Komîsyona Ciwanan Ahmet Şeker der heqê Mûsa Anter de semînerek da beşdaran. Piştre Xwediyê Rojnameya Azadiya Welat Celaledin Yöyler axaftinek dirêj li ser bawerî, şoreşgerî û rewşenbîriya Mûsa Anter kir. Yöyler Apê Mûsa şiband Sokratesê Hemdemî û şagirtê wî Eflaton. Yöyler her wiha got ku her çiqas Ömer Muxtar ji bo gelê Lîbyayê li hemberî îtaliyan, Gandhî û Nehrû ji bo gelê hindî li hemberî îngilizan bi bîr û bawerî û çekan têkoşîn kiribûn. Mûsa Anter jî ji bo gelê kurd bîr û baweriyên xwe kirine çekên herî karîger. Her wiha Celaleddin Yöyler nivîseke Apê Mûsa bi navê "Eşqa welat" ku di rojnameya Welat de hatibû weşandin ji beşdaran re xwend.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

### Çalakiyên li bajarên din

**Amed:** Bi beşdariya 250 kesan li Navenda Çanda Mezopotamyayê Apê Mûsa hat bibîranîn. Piştî kurtelîstika bi navê "Zarokên Apê Mûsa" ligel komên mûzîkê, beşdar bi dîlan û govendên xwe şehidên xwe bi bîr xîstin.

**Edene:** Ji hêla komîsyona ciwanan ve roja 20'ê rezberê bi beşdariya 200 kesî bîranîn pêk hat. Di bîraninê de Serokê HADEP'a Edeneyê Eyûp Karageçi axaftinek kir. Di axaftina xwe de Karageçi da zanîn ku, sîstema tirk her dem hêzên li hemberî xwe mîna neyar dibîne. Karageçi da zanîn ku kujerên Mûsa Anter û bi sedan welatparêzan, di bûyera Susurlukê de eşkere bûne, lê ew ji hêla dewletê ve hatin berdan. Piştî axaftina Karageçî Serokê Komîsyona Ciwanan Cüneyt Acar çend dîmen ji jiyana Apê Mûsa pêşkêş kirin.

**Mêrsîn:** Roja 21'ê rezberê li avahiya HADEP'ê bîranîn pêk hat. Zêdetirî 300 kesî beşdar bûn. Di civînê de Serokê HADEP'ê Dr. Veli Aydoğan li ser Apê Mûsa axaftinek kir. Civîn bi çalakiyên NÇM'a Mêrsînê qediya.

**İzmir:** Bîranîna İzmirê jî roja 21'ê rezberê, li HADEP'a Konakê ji hêla Komîsyona Ciwanên HADEPê ve bi navê "Em ronakbîrên xwe binasin" hate lidarxistin. Feqî Huseyn Sağnıç û Cemşîd Bender wekî axifger beşdarî çalakiyê bûn. Feqî Huseyn li ser ziman û nasnameya edebiyatê ya Apê Mûsa sekinî. Wî da zanîn ku divê jiyana Mûsa Anter ji jiyana Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî cihê neyê fikirîn. Cemşîd Bender jî li ser rewşenbîrî û welatparêziya Apê Mûsa rawestiya.

**Enqere:** Ji hêla Ciwanên HADEP'a Çankayayê ve roja 21'ê rezberê, li "Gençlik Parkı Açık Hava Tiyatrosu" yê şahiyeke aştiyê pêk hat. Di vê şahiyê de Apê Mûsa hate bibîranîn. Piştî rêzgirtina hurmetê û axaftina Serokê HADEP'a Çankayayê Fevzi Beter, Serokê HADEP'a Enqerêyê Kemal Okutan axaftinek kir. Okutan got ku, ji sala 1990'î û vir de gelê kurd bi hezaran şehîd dane, lê ew tu car neqediyane, berevajî ew bi van kuştinan zêde bûne. Her wiha Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Mehmet Satan jî axivî û wiha got: "Her çiqas dewlet rê li ber Trêna Aştiyê ya Mûsa Anter girtibe jî, wê nikaribû gelê kurd ji qad û meydanan dûr bixe.

**Tarsus:** Di çalakiya ku roja 21'ê mehê pêk hat de serokê HADEP'a Mêrsînê Dr. Velî Aydoğan axaftinek kir. Endamên Komîsyona Ciwanan der heqê Cigerxwîn, Apê Mûsa Î. Beşîkçî, Ehmedê Xanî û Wedat Aydin de axivîn. Civîn bi mûzîkên cur bi cur ji komên muzîkê, qediya.

NAVENDA NÛÇEYAN